

Fermandarên tirk ên ku bi PKK'ê re hevdîtin pêk anîne:

Guherîna dewletê di destê PKK'ê de ye




■ Ev bi salan e ku dewleta tirk dibêje: "Em bi PKK'ê re li hev rûnanin, lewre ew terorîst in." Lê bi daxuyaniya berpirsên PKK'ê yên hefteya çuyî diyar bû ku di navbera PKK û dewleta tirk de danûstandinên dûvedirêj hatine kirin û agirbestên yekalî yên PKK'ê li ser daxwaza rayedarên tirk pêk hatine. Her wiha agirbesta dawîn jî piştî axaftina qasidê dewleta tirk û Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan hatiye ragihandin.

Bi vê yekê jî diyar dibe ku di serî de generalên tirk, rayedarên dewleta tirk gel dixapînin. Di hevdîtinan de tiştekî balkêş ev bû, fermandarên tirk ji bo guhartina rengê dewletê jî PKK'ê alîkariyê dixwazin. Çapemeniya tirk wekî her car dîsa xwe li keriyê danî û qet cih neda vê nûçeya girîng. Ev yek jî nîşan dide ku medya tirk jî şîrîkê sûcên rejîmê yên bo xapandina gelê tirk e. (Nûçe:R.3)

Rewşenbîr û siyasetmedarên Kurdistanî li ser Kongreya Neteweyî axivîn:


MESELE NE MESELEYA PARTIYEKÊ YE YA MILETEKÎ YE



■ Bi taybetî piştî ku Konferansa Navneteweyî ya li ser kêşeya kurd hate rojevê, kurdan lez da xebatên xwe yên bo kongreyê. Ji ber vê yekê jî çar aliyên Kurdistanê partî, sazî û kes li hev civiyan. Der barê vê yekê de Av. Salih Şahin wiha dibêje: "Kî dikare bibêje ev platform nikare gel temsîl bike. Li vir jî Hewlêrê, Mehabadê, ji Semsûrê, Gurgumê, Amedê kurd hene. Her wiha kesên ku dîn û îdeolojiyên wan jî hev cûda ne hene. Netewe ev e."

Li aliyê din Dr. Mahmûd Osman dibêje mesele bi PKK'ê ve negirêdayî ye û wisa didomîne: "Berî hatina Öcalan a bo Romayê hinekî mafê wan hebû bêjin; PKK'ê îdare dike. Lê îro rewş hatiye guhartin." (Hevpeyvîn: R. 8-9)

Azadiya WELAT



SAMI TAN

Derket holê ku agirbesta yekalî li daxwaza dewletê hatiye ragihandin. Tê dîtin ku rayedarên dewletê, di vî warî de . jî gelê tirk dixapînin.

Di şeva 28'ê gelawêjê de dema Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bo roja 1'ê rezberê agirbesta yekalî ragihand, em ji bo vekirina Nûnergeha Azadiya Welat li Amedê li maleke welatparêz li ber televizyona kurdî bûn.

Dilê me ji bîr ku dê cara yekemîn Azadiya Welat di nava dilê Welatê Rojê de şax vede, geş bû. Piştî tele-konferansê dilê me geştir bû, lewre birêz Öcalan qala bi hev re pîrozkirina 75 saliya komarê dikir. Beşdariya rojnamegerên tirk û biryara MGK'ê ya bi rengê "Em dê axaftina Öcalan bişopînin" nîşaneyê hin tiştan bû.

Her çiqas kes ewqas ne safik bû ku ji aştîyeke bi hêsanî bawer bike jî, hêvîdariya me heta guhdarkirina nûçeyên medyaya tirk domiya. Piştî ku me li nûçeyên televizyonên tirkan temaşe kir, şik û guman bi me re zêdetir bû. Lewre tiştê di helwesta wan de nehatibû guhartin. Televizyonên tirkan bi awayekî kurt di çarçoweya şerê psikolojîk de nûçe ragihandibûn.

Li Amedê berî civînê jî, piştî civînê jî rojeva sereke agirbest û aştî bû, kesî hêvi-

Aştî û derew

ya xwe qut nekiribû. Her kes li hêviya otobûsa aştîyê bû û bi amadekariya wê re bilî bû.

Roja 29'ê rezberê bi beşdariyeke girseyî Nûnergeha Azadiya Welat hate vekirin. Hêzên dewletê tevî ku merasîm li hundir bû jî, hinek astengî derxistin, lê rê li ber merasîmê nehate girtin. Di dawîya merasîmê de polîsan jî derî li gengeşîyeke sivasî vekir. Xwedêgiravî wan jî aştî û çareserî dixwest.

Hêviya bo aştîyê bi êrişên li ser "Dayikên Şemiyê" kêmîr bû, lewre vê yekê nîşan dida ku dê dewlet helwesta xwe neguherîne. Dîsa jî her kesî hêvî dikir ku dê çalakîya Otobûsa Aştîyê neyê astengkirin. Lê mixabin ew çalakî jî hate astengkirin û komployên mezin jî pêk hatin.

Wê demê jî gelek kesan dizanî ku hin tîkiliyên nehênî di navbera her du aliyên şer de hene. Heta vê hefteyê kesî nedizanî ku tîkilî demeke ev qas dirêj û di asteke bilind de hatine meşandin. Roja 4'ê rêbendanê di bernameya Sêla Sor de nûnerên PKK'ê danûstandinên di navbera

partiya wan û dewleta tirk de eşkere kirin.

Bi van daxuyaniyan derket holê ku agirbesta yekalî piştî danûstandinên dûvê dirêj hatiye ragihandin. Her wiha gotinên rayedarên dewleta tirk ên bi rengê "Em bi terorîstan re li hev rûnanin" pûç derdikevin. Tê dîtin ku rayedarên dewletê wekî her tiştê din, di vî warî de jî gelê tirk dixapînin.

Dem a mirov li van danûstandinan hûrdibe, tiştêkî din mirov dide ponijandin. Rast e dek û dolabên serdestên tirkan tînanin. Jixwe serdestên tirk li ber destê bîzansiyan perwerde bûne û di vî warî de serî ji wan girtiye. Lê gelo mirov dikare çawa ewqas durûtiyê bike?

Ev helwesta kirêt û gemar hê jî didome. Dil dixwest ku piştî vê bernameyê hinek tişt bîn nîqaşkirin. Lê medyaya tirk dîsa xwe li keriyê daniye û wekî ku tiştêkî wisa ne, ewimibe tevdigere. Divê her mirovê aştîxwaz û demokrat van danûstandinan ragihîne cîranê xwe yê tirk û wan hişyar bike. Ji bo ku ew bi derewan nexapin û riya aştîyê vebe.

Ferhengok

bafirok: uçurtma	(süreç)
berbor: kevneşop, (gelenek)	pêwîst: pêdivî, lazim
ber: enî, cephe	piştgirî: destek
beşdarbûn: tevlibûn (katılmak)	qad: war, gorepan (alan)
damezrandin: avakirin	ragihandin: bildirim, iletim
dêrîn: kevnare, qedim	ray: dîtin, boçûn, nêrîn
dijber: karşit, muhalif	resen: orjinal, otantik
ferheng: çand, kultur	reşerojî: bextreşî
ferqizîn: velistin(burkulma)	rêxistin: örgüt
fitişîn: yekcar ji ber çavan windabûn	rûxandin: hilweşandin,
gerîdok: seyar	sazî: kurum
guncan: guncaw(uygun)	sazkirin: organîzekirin
hilbijartin: seçim	şilik: zîz û kûbar
hilbijêr: seçmen	tamara xewê: uyku
kêşe: arîşe, problem	taybetmendî: xislet (özellik)
ligel: digel, tevî, pêre	têkoşîn: mücadele
mafdar: haklı	têkşikandin: tîk-birin (yenme, basturma)
netewe: millet	tevger: hareket
neteweyî: ulusal	vedizîn: xwe jê veşartin
nîqaş: gotûbêj, gengeşî(tartışma)	veşewitîn: ji ber berf, deterjan hwd.
nûner: temsilkar	
pêkanîn: çekirin	
pêvajo: deman	arına dest û laş

Ragihandin

Ji ber ku biryara Hilbijartina Giştî bo 18'ê avrêla (nîsan) 1999'an hatiye girtin. Lîsteyên qeyda hilbijêran li muxtar û cihên ku wan diyar kiriye hatine daleqandin. Em ji hemû endam û dilxwazên partiya xwe dixwazin ku herin li lîsteyan binêrin û heke navê xwe tê de nebînin, navê xwe bidin nivîsandin. Divê reyeke HADEP'ê jî ji ber ketimbûnê bi avê de neçe. Bi bîr û baweriya ku dê gelê me berpirsiya xwe bîne cih em rêz û silavên xwe pêşkêş dikin.



Navenda Giştî ya
HADEP'ê

Fermandarên tirk ên ku bi PKK'ê re hevdiîn pêk anîne: Guherîna dewletê di destê PKK'ê de ye

Ev bi salan e ku dewleta tirk PKK'ê wekî rêxistineke "terorîst" bi nav dîke û dibêje: "Em bi terorîst û cudaxwazan re li hev rûnanin." Lê roja 4'ê rêbendanê berpirsên PKK'ê di bernamêya bi navê Sêla Sor a MED-TV'yê de bi belgeyan li ber çavan raxist ku dewleta tirk heta niha li dora 10 çaran bi PKK'ê re têkilî danîne û hevdiîn pêk anîne.

Di 93'yan de hevdiîna yekemîn pêk hat

Hevdiîna dewleta tirk yê bi PKK'ê ji sala 93'yan yanî ji agirbesta yekemîn a ku ji aliyê PKK'ê ve hate îlankirin didomin. Di sala 93'yan de Sekreterê Giştî yê YNK'ê Celal Talabanî û çend rojnamegerên tirk wekî Cengiz Çandar û İsmet İmset navberkariyê dîkin. Ew kes jî li ser navê Turgut Özal çûne bal Öcalan û peyama Özal ragihandinê. Li gorî ragihandina di agirbestê din de jî he man rêbaz hatiye bikaranîn. Bi pey belgenamêyên di arşîva PKK'ê de têkiliya rasterast de di sala 96'an de di meha avrêlê de pêk bihata. Hingî jî Mesut Yılmaz serokwezîr bû. Dewleta tirk hê wê demê jî bo çareserîya kêşeya kurd li ser mîna-ka Îsraîl û Filîstîne fikirîye.

Di wê demê de jî aliyê nivîskar Faik



Di meha rezberê de çar peyamên din jî bo Öcalan tîr ragihandin û tîr diyarkirin ku, ji bo bi rehetî tevgerîna Öcalan, ewê bi Suriyeyê re bikevin têkiliyê. Her wiha di peyamê de tîr diyar kirin ku dê li ber mîfînga İzmirê jî tu asteng dernekevin. Di peyamê de tîr ragihandin ku ew li ser hemû hezan de ne serdest in.

Bulut ve têkilî tîr meşandin. Piştî Bulut, serşewirmenda Mesut Yılmaz, Alev Alatlı navberkariyê dîke. Berî ku nivîskar Alatlı bi rêveberên PKK'ê re têkiliyê deyne, bi Mesut Yılmaz re civînekê çêdîke. Piştî wê civîna Alatlı jî rêveberên PKK'ê dixwaze ku ew li Rohhilata Navîn bi Öcalan re hevdiînekê pêk bîne. Her çîqas Serokê PKK'ê pêşniyaz pejirandî be jî, hevdiîna ji aliyê dewleta tirk ve nehatiye pêkanîn. Piştî ku hikûmeta Yılmaz tîk diçe û hikûmeta DYP û RP'yê tîr ser kar, têkilî jî aliyê şewirmendê Erbakan İlnur Çevik ve tîr meşandin. Dema têkilî tîr danî, Çevik jî rayedarên PKK'ê dixwaze ku bi Öcalan re hevdiînekê pêk bîne. Öcalan ve hevdiîna jî dipejirîne, lê hevdiîna dîsa ji aliyê dewleta tirk ve tîr astengkirin. Li gorî nixandîna berpirsên PKK'ê yê ku beşdarî bernamêyê bûbûn, sedema bîngêhîna ya pêknehatina van hevdiînan, bêhawetîya siyaseta medarên wê demê bû û niha jî tiştê neguherîye.

Bêguman her kes pê dizane ku mekanîzmaya siyasî ya Tirkiyeyê jî bo çareserîya kêşeya kurd nikare tu gavan biavêje. Ev yek berî vêga bi sê salan ji aliyê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ve jî hatibû diyarkirin. Ji bêçaretîyê çar çaran

artêşa tirk mudaxele yî mekanîzmaya siyasî dîke.

Şer gelan tengezar dîke

Îcar jî artêşa tirk dest davêje kar û roja avrêla 97'an li bajarê Hollanda Arnheimê, li hotelekê du fermandarên artêşa tirk û du rayedarên PKK'yî li hev kom dibin û hevdiîna wan li dora du saetan dikişîne. Li gorî berpirsên PKK'ê, di hevdiîna de fermandarên tirk dîtinên xwe wiha anîne zimên: "Şerê ku 13 salan dom dîke zirareke mezin da her du alîyan jî. Gel tengav dibe. Divê ev yek çareser bibe. Lewre jî pêwîst e hevdiîna dest pê bikin. Ji ber şer li ba her du alîyan jî pêşdarazî xurt dibe. Divê herdu alî jî lez bidin xebatê xwe yê bo raya giştî ya tirk û kurd. Heke pêwîst bike divê çavkaniyên nêzî dewletê û nêzî PKK'ê daxuyanîyên erênî bidin. Ji bo piştgirîya raya giştî hêzên sîvil yê li Tirkiyeyê dikarin bi kêr bînin. Ji bo qedandina şer di nav artêşê de gavên pozîtîf tîr avêtin. Ev hevdiîna berde wama hevdiîna ku bi Teoman Koman re hatibû kirin e. (Hevdiîna li Amedê pêk hatibû.)"

Piştî wê hevdiîna de di 14'ê gulanê de li Başûrê Kurdistanê operasyoneke leşkerî

tîr lidarxistin. Lewre jî hevdiîna bo demeke kurt hatine rawestandî.

Piştî hevdiîna Holladayê bi 8 mehan di 18'ê meha gelawêjê de navberkarê dewleta tirk bi riya telefonê rasterast bi Öcalan re têkiliyê datîne û peyama dewleta tirk radigihînhê. Di axaftina navberkar û Öcalan de bi tevahî li ser avêtina gavên pratîk tîr rawestandî. Nemaze piştî ku Öcalan çêlî agirbestê dîke, navberkar jî guherîna bi avêtina gava PKK'ê ve girê dide. Di dialogê de bi giştî li ser çareserîya kêşeya kurd hatiye axivîn. Dîsa di diyalogê de navberkar tevlibûna xwe ya bo dîtinê Öcalan tîr zimên û dadixuyîna ku mekanîzmaya nû bi awayekî dilpak nêzî kêşeyê dibe. Navberkar di berde wama axaftina xwe de diyar dîke ku ew nikarin ve rewşa fiilî şîrove bikin. Ew diyar dîke ku, bi hêzeke bîngêhîna re rû bi rû ne. Navberkar jî Öcalan re dibêje: "Mekanîzmaya giştî jî wekî ku hûn difikirin xwe hêdî hêdî diguherîne." Di hevdiîna de peyva "Başkanım" jî balê dikişîne.

Piştî wê diyalogê bi sê rojan dewleta tirk peyamekê bo Öcalan bi riya navberkar radigihînin rayedarên PKK'ê. Di peyamê de wiha tîr gotin: "Me girîngiya stratejîk a giştî ya kêşeyê diyar kir. Em

mercên giştî û yê siyasî nadin pêş. Em nexwazin hûn çekên xwe deynin. Lê em li benda mercên nû û gavên we ne. Em li ber çapemeniyê tu astengîyan dernaxin. Li gorî me, encamên siyasî yê ve pêvajoyê wê erênî bin. Her çîqas jî bo tevlibûna pêvajoya siyasî me hûn pêşniyaz nekiribin jî, dê gavên erênî re li ber tevlibûna we jî vekin. Di 93-96'an tahrîbatên zor mezin pêk hatin. Ev pêvajoyê nêzîkdeyîna îradeya bîngêhîna e. Mekanîzmaya siyasî hatiye agahdar kirin. Di nav me de jî pêvajoya xwe serifandinê dest pê kirîye. Me mudaxele yî dawetê kir. (Di vir de astengkirina çuyîna Demirel a bo daweta Ağar tîr gotin.)"

Piştî wê peyamê di meha rezberê de çar peyamên din jî bo Öcalan tîr ragihandin. Di wan peyamên de tîr diyarkirin ku, ji bo bi rehetî tevgerîna Öcalan, ewê bi Suriyeyê re bikevin têkiliyê. Her wiha di peyamê de tîr gotin ku dê li ber mîfînga İzmirê jî tu asteng dernekevin. Di peyamê de tîr ragihandin ku ew li ser hemû hezan ne serdest in. Di dawîya peyamê de jî wiha hatiye gotin: "Carinan hinek tişt diguherin. Hûn dikarin mafê xwe berhingariya rewşa (meşrû mudafa) bi kar bînin. Nameya we ya gelawêjê nameyêke stratejîk bû."

Agirbest û komplo

Piştî wê peyamê bi demeke kurt Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan 28'ê meha gelawêjê di bernamêyê MED-TV'yê de diyar kir ku ew dê yekê rezberê di Roja Aştiyê ya Cihanê de agirbestê îlan bikin. Dewleta tirk gelek rojnamegerên tirk şandibûn bernamêyê. Piştî ku agirbest hate îlankirin, dîsa bi riya navberkar peyamek bo Öcalan ji aliyê dewleta tirk ve tîr şandin. Di peyamê de tîr gotin: "Ji ber nebûna mercên muhatap girtina PKK'ê me gotibû, HA-DEP wekî muhatap guncaw e. Birêz Bozlak hat bi rayedarên dewletê re hevdiîna pêk anîn. Axaftina we ya di 28'ê gelawêjê de zor tîkûz bû. Divê binê wê axaftinê bê dagirtin. Heta demê têkilî hatin rawestandî"

Dewletê piştî agirbestê jî PKK'ê danîna çekên dixwest. Di meha kewçerê de dewletê çar çaran bo Öcalan peyam şandin. Lê di peyama dawîna hinek gefan bal dikişandin. Nameyên bo fermandarên tirk û yê ji bo Ewropayê û her wiha hevpeyvîna ku bi rojnameger Fatih Altaylı û rojnameya El-Hayatê re hatibû kirin, wekî hincet hatibûn nîşandayîn. Di peyamê de dihate xwestin ku Öcalan xwe di ber çavan re derbas bike. Piştî wê peyamê dewleta tirk dest bi komplo yê xwe kir. Ev komplo hê jî didomin. Lê raya giştî ya cihanê jî edî pê dizane ku dewleta tirk bi PKK'ê re rûniştîye û bo çareserîya kêşeya kurd hevdiîna pêk anîne.

Berdevkê "Bextereşên Cîhanê" Frantz Fanon:

Ez kî me

"Guleya Yekem" an jî berdevkê "Bexteşên Cîhanê"; Frantz Fanon di nav gelên bindest, rewşenbîr û şoreşgerên cîhanê de yek ji mirovên bijarte ye. Ev ronakbîr û şoreşgerê payeberz îro jî di sêrî de gelê kurd, di nava hemû gelên cîhanê yên bindest de xwedî heman wateyê ye.

Frantz Fanon di sala 1925'an de li Girava Martinîkê ji dayik dibe. Martinîk di bin wê demê dagirkeriya Franseyê de ye. Malbata wî jî Afrîkayê hatiye sirgûnkirin. Li hemberî wê yekê dîsa jî malbata wî li şûna berxwedanê, pişaftin

Jean Paul Sartre di pêşgotina xwe ya jî bo pirtûka Fanon a bi navê Bexteşên Cîhanê de jiyana Fanon wiha dinirxîne: "Heger çekên me tunebin jî ji bo ku em dagirkeran têk bibin kêrikên me hene." Lê mirovekî wekî Fanon ne kêrik e çeka herî mezin e.


û çewisandina li ser reşikan dipejirîne. Bavê Fanon mirov dikare bibêje ji birju-waziya reşikan e û mufetişiyê dike. Heft xwişk û brayên wî hebûn.

Frantz Fanon di sala 1946'an de li Zanîngeha Lyonê dest bi perwerdeya tipê dike. Fanon beşa psikiyatristiyê kuta dike. Fanon xebata xwe ya di warê psikolojiyê de ya yekem derbarê bandora cudatiya nijadan a neyînî ya li ser reşikan de dinivîse. Vê xebatê di pirtûka bi navê "Çermê Reş, Rûpûşên Spî" de kom dike û nexweşiyên psikolojîk ên mirovên ji çanda xwe dûrketî yên di bin mêtîngiriyê de analiz dike.

Frantz Fanon piştî ku dibe psikiyatrist vedigere Martinîkê û ji bo ku li Afrîkayê bijîştîyê bike serî li meqamên fermî dide. Lê ev daxwaza wî tê redkirin. Piştî wê bûyerê Waliyê Giştî yê Cezayîrê Robert Lacost serbijîştîya (başhekim) Blida Joinville pêşniyarî Fanon dike û ew wê qebûl dike. Fanon sê salan li vir dimîne (1954-57). Rûdanên wê pêvajoyê bandoreke pir mezin li Fanon dikin. Fanon rewşa gelê Cezayîrê ya ku ji ber dagirkeriya Franseyê pê re rû bi rû maye, ji nêzik ve dibîne. Mirov dikare bibêje Fanon ji berê ve ne dûrî wê psikolojiyê ye. Lewre ew jî ji ber reşikbûna xwe, bindestiya xwe hatiye çewisandin û pişaftin. Van dîtinan pirsek di serê fanon de derxistibû holê. Ez kî me? Ji wê demê pê ve mirov dikare jiyana Frantz

Fanon wekî bersivandina wê pirsê bi nav bike. Fanon pêşî tekiliyê bi şervanên azadiyê yên Cezayîrê re datîne. Klînîka ku tê de dixebite, ji bo xebatên têkoşina gelê Cezayîrê guncaw dibîne û di wê klînîkê de şervanan vedîşêre, perwerde di-

çe li karê xwe sor dibe. Bi gelemperî bo rizgariya gelên Afrîka û gelên bindest bi taybetî ji bo gelê Cezayîrê xebatên pir hêja dike. Berpirsiyariya karê nivîsan a weşanên FLN û ALN'ê (Artêşa Rizgariya Cezayîrê) dike. Ji a-



Fanon rewşa gelê Cezayîrê ya ku ji ber dagirkeriya Franseyê pê re rû bi rû maye, ji nêzik ve dibîne. Mirov dikare bibêje Fanon ji berê ve ne dûrî wê psikolojiyê ye. Lewre ew jî ji ber reşikbûna xwe, bindestiya xwe hatiye çewisandin û pişaftin.

ke, qasidiyê ji wan re dike û ji FLN'ê (Eniya Rizgariya Neteweya Cezayîrê) re çek, xwarin û pêdiwiyên din peyda dike. Lê ya herî balkêş ev e ku Fanon perwerdehiya psikolojîk bi pisporî dide şervanan. Rê û rêçikên berxwedana li hemberî îşkenceyê, têkbirina şerê psikolojîk û hwd.

Fanon radîkaltir dibe

Di sala 1955'an de xebatên wî yên di klînîkê de êşkere dibin. Piştî wê Fanon dest bi xebatên tundiraw (radîkal) dike û ji bo şoreşgeriya profesyonel û nehênî dikeve nava têkoşinê. Li welatên Afrîkayê bi serok û serkêşên şoreşger re hevdiîtinan pêk tîne. Daxuyaniyan dide ji bo ku hunermend û nivîskarên reşik beşdarî şoreşê bibin. Frantz Fanon her

liyê rewşenbîrên cîhanê ve Fanon wekî berdevkê "Bextereşên Cîhanê" tê binavkirin. Sedema wê yekê pirtûka Fanon a bi navê Bextereşên Cîhanê ku bandoreke gelekî mezin li Ewrûpayê û gelên bindest kiribû, bû. Ew, bo gelên bindest wekî "Guleya Yekem" tê nirxandin.

Kesê ku Fanon dixwe rojeva gelê kurd û tirk zanyarê hêja İsmail Beşikçi ye. İsmail Beşikçi ji bo Fanon wiha dibêje: "Fanon teza Guleya Yekem e. Ew gule di sêrî de ne li hemberî dijmin, li hemberî dirok, kesayeti û psikolojiya binketîne tê teqandin." Li gorî Beşikçi Fanon heta piştî salên 80'yî jî li Tirkiye û Kurdistanê nayê naskirin. Sedema wê bandora kemalîzmê ya li ser rewşenbîr û çepgirên tirk û psikolojiya neteweya serdest e.

Ziman kesayeti ye

Fanon di pirtûka xwe ya bi navê Çermê Reş û Rûpûşa Spî de wiha dibêje: "Berxwedana Vietnamiyan a li hemberî Komên Darveker ne ji bo dirokê kevn bû. Ew berxwedan ji bo nîwê pêşerojê bû." Li gorî Fanon mirov, di hewla westa serhildanê ya li dijî lanetkirinê, redkirinê, windakirina ziman û kesayetiye ye. Her wiha pişaftin, şertê sistê dagirkerê yekemî e. Ji ber ku ziman jiyan, çand, dirok, hebûn û tunebûna mirovan e. Fanon diyar dike ku ziman psikolojiya mirovan e. Li gorî wî dema mucahidêk bi franseyî nepeyive an jî bi darê zorê bi frensî nedine axaftin, şaftina wî ewqas ne hêsan el û heta mimkûn e jî. Berdevkê "Bexteşên Cîhanê" Fanon tekiliya nijad, neteweyên psikolojiyê wiha dinirxîne: "Mirov welatên dagirgeh dikeve psikolojiyê xwe biçûkdîtîne. Ew xwe çiqas bi nexweşik, lawaz, bêkêr bibîne, dagirger û serdestan ewqas çak, mezin û xurt dibîne; çiqas zimanê xwe bilezûbez ji bike û zimanê serdestan çiqas baş bibê xwe ewqas dike şûna mirovan. Fanon nalîzên Fanon wê rastiyê derdixin holê. Jiyan gelekî girêdayî ziman û çanda ye.

Îro li Kurdistanê ev rastî zêdetir bi bîçav dibe. Berî ku Têkoşina Rizgariya Kurdistanê dest pê bike û ewqas bi bîçav bikeve, kî çiqas tirk bûya, ewqas mirov bû.

Frantz Fanon ji aliyê ramanî ve pişgiriya dide mirovên ku li dijî mêtîngiriyê û împeryalîzmê derketine. Ali Şerîati, Jean Paul Sartre, Albert Memmi wan kesan çend heb in. Her çiqas Şerîati bi Fanon re ne di heman fikrê de jî destek daye tevgera Fanon û fikrê wî ji xwe re wekî rêbazên xebata civaknasîyê nişan dane. Jean Paul Sartre pêşgotina xwe ya bo pirtûka Fanon a bi navê Bextereşên Cîhanê de jiyana Fanon wiha dinirxîne: "Heger çekên me tunebin jî ji bo ku em dagirkeran têk bibin kêrikên me hene." Lê mirovekî wekî Fanon ne kêrik e, çeka herî mezin. Li gorî Sartre, Fanon rewşenbîr, şoreşgerî, humanîstî li hev honandiye. Bi Engels re kesê ku diyalektîka dîroka nalîz kiriye Fanon bi xwe ye.

Dema Fanon dijiya, sê pirtûkên wî hatin weşandin. Fanon berî mirina xwe wesiyet kiribû ku piştî mirina wî, ew ser erdê Cezayîrê, li goristana şehîdê bê naştin. Frantz Fanon di kewçê 1961'ê de li Amerîkayê jiyana xwe dest da. FLN û ALN'ê ligel dijarwarbûna wesiyeta wî jî, wesiyeta wî bi mezin meke mezin lê bi dizî bi cih anî. Ji ber ku cihê Fanon dixwest lê bê veşartinê bin kontrola leşkerên Frensayê de bû.

Arîşeyên li ber tewangbariya kurdî

Di zaravayên kurdî yên Bakur de tewangbariyêke tam heye. Mirov di navdêr, cînavk, jimarnav û hinek cureyên rengdêran de tewangbariyê dibîne. Armanca tewangbariyê jî heve derxistina kirde (subjê) û bireser (obje) e.

Pirjimariya navdêrên xwerû

Ev tewangbarî jî xwe re hinek arîşeyan jî tîne. Her wekî tîne di zimanên din de pirjimariya bi alikariya hindêk qertafan tîne nîşandayîn. Wekî mînak di tirkî de ew qertaf /-er/, /-lar/ e, di îngilizî de ew gelemperî /-s/ ye. Di zaravayê soranî de ew /-ekan/ e û di kirmanckî de /-î/ ye. Lê di kurmanckî de qertafeke bi vî rengî tîne.

Mirov dikare bi çend mînakên mijarê zelaltir bike:

Tirkî	İngilizî	Soranî	Kirmanckî
Ağaçlar	trees	darekan	darî/darekan
Sesler	voices	dengekan	vengî/vengan

Bo nimûne di kurmanckî de ji ber ku pirjimariya navdêran bi qertafa tewangê /-an/ tîne nîşandayîn, di navdêrên ku natewin de nîşandayîna pirjimariyê di nava hevokê de bi alikariya cînavkên pêrebestî yên ku bi dawiya lêkeran ve dibin, pêk tîne. Bo nimûne di hevoka "heval hatin" de pirjimariya navdêrê jî lêkera "hatin" diyar dibe. Mirov nikare pirjimariya navdêra "heval" bi serê xwe wekî pirjimar nîşan bide. Heke mirov ji bo diyar kirina pirjimariya navdêrê qertafa tewangê /-an/ bi kar bîne, dê rêpîvana rêzimana tewangbariyê bînpê bibe. Ev

xeletî di hin devokan de belavbûyî ye.

Hin caran nivîskarên kurd jî di vî warî de dikevin xeletiyên. Di vî warî de mînaka herî berbiçav wergera navê pirtûka John Steinberk a bi navê "Mişkan û mivan e", navê pirtûkê yê resen "Of Mices and Men (A Mişk û Mirovan an jî Mişk û Mirovan)" e ku bi şeweyê "Fareler ve İnsanlar" li tirkî hatiye wergerandin. Ji ber ku wergêr Firat Cewerî jê re çareyek nedîtiye bi vî rengî wergerandiye.

Di kirdî de qertafên tewangê

Di zaravayê kirmanckî de her wekî jî mînakên jor jî diyar dibe, pirjimariya navdêrên xwerû bi alikariya qertafa /-î/ pêk tîne. Lewre hevoka li jor di kirmanckî de dibe "Embazî amey" û tu arîşe dernakevin holê. Lê, ev yek nayê wê wateyê ku di tewanga vî zaravayî de arîşe nîn in. Bo nimûne di warê qertafa navdêrên mê de dubendiyek di kirmanckî de heye; li herêma Dersimê ew qertaf /-e/ ye, lê li herêma Siwêregê ew qertaf dibe /-î/. Her wekî çawa ku di kurmanckî de tewanga navdêrên nêr hêdî hêdî jî holê radibe, di kirmanckî de jî tewanga navdêrên mê ne bi rêk û pêk e. Dîsa qertafa /-e/ jî bo guhartina zayenda navdêrê bi berfirehî tîne bikaranîn, ew jî rîsta wê ya sereke (ji hev derxistina kirde û bireser) jî holê radike.

Li ser vî mijarê çend mînak:

nêr	mê
leşker	leşkere
erjan	erjane

*qij qije
dewij dewije*

Arîşeya cînavkên veşarî

Arîşeyêke din dema ku mirov pirjimariya navdêrê bi alikariya cînavkên pêrebestî nîşan dide, derdikeve holê. Di kurmanckî de lêker her tim li gorî cînavkê û navdêrên xwerû tîne kişandin. Yanê lêker bi cînavkê û navdêrên xwerû re lihevkerî ne. Ji bo mijarê bi bîr bixim çend mînak pêwîst in.

<i>Ez te dibînim</i>	Min tu dîtî
<i>Tu wan dibînî</i>	Te ew dîtîm
<i>Ew me dibîne</i>	wî em dîtîm
<i>Em wî dibînin</i>	me ew dîtî
<i>Hûn wê dibînin</i>	we ez dîtîm
<i>Ew min dibînin</i>	wan ew dîtî

Di hin devokên kurmanckî de bi taybetî dema cînavka xwerû dibe bireser ew rêpîvan tîne bînpê kirin. Bo nimûne "te min dît" tîne gotin. Lê arîşeya mezintir di dema mînaka "Wan ew dît" de ye. Bo nimûne, di hevoka "agir vexist" de tîne zanîn ku kirde jî bireser jî yekjimar e. Lê dema me got: "Gundî gihîştin hev û agirêk vexist." Dê ev hevok li ba gelek kesên şikestî xuya bike û dê di cih de lêkera "vexistin"ê bikin pirjimar û dê hevok bi vî rengî be "agirêk vexistin". Li vî derê rêpîvan bînpê dibe, lewre cînavka pêrebestî /-in/ divê pirjimariya bireser ango "agir" nîşan bide, ne ku gundiyan nîşan bide. Ew çewtî xwe wekî "xeletî menşûr" dide der, lewre di piraniya weşanên kurdî de balê dikişîne.

Sedema bingeşîn a vî xeletiyê wekî

"cînavkên veşarî" bikaranîna cînavkên pêrebestî ye. Di kesên yekjimar de ew zêde tevliheviyê dernaxe pêşberî mirov. Wekî "hatim, hatî, hat" lê yên pirjimar giş wekî hev in, lewre jî mirov nikare wan wekî cînavkên veşarî bi kar bîne. Jixwe, ev mijara cînavkên veşarî zêde li kurdî nayê, bi bandora tirkî ketiye ser zîmanê gelê me. Lewre di tirkî de ew qertaf gişt jî heve cuda ne û dema mirov wan bi kar tîne pêwîstî bi cînavkan namîne.


Di dawiya vî nivîsê de mirov dikare bibêje, xetereya mezintirîn li ber tewangbariya zaravayên Bakur, tevlîheviya di hinek devokan de ye. Di van devokan de rêpîvana tewangê bi temamî tîne bînpêkirin. Bo nimûne "min pirtûkê xwend" tîne gotin. Yanê hem kirde hem jî bireser ditewînin. Li hin cihan jî natewînin, bo nimûne dibêjin: "Ew şev hate cem me." Di vî hevokê de jî diviya rengdêra şanîdanê /ew/ bihata tewandin û bibûya /wê/ û hevok wiha bûya "Ew (kirde) wê (rengdêra şanîdanê) şevê hate cem me."

Hindek lêkolînerên biyanî jî ber van sedeman, didin zanîn ku rêpîvana tewangbariyê di kurmanckî de ber bi berzebûnê ve diçe. Her çiqas xebatên van salên dawî jî bo rastandina çewtiyên belavbûyî dibin alîkar jî, xetereya li ber rêzimanê van zaravayan jî holê ranebûye. Divê kes nebêje, heke tewangbarî nemîne jî zimanê kurdî xesarê nabîne, lewre di van devokan de tu rêpîvanên bi rêk û pêk nîn in.

SAMÎ BERBANG

Her dem jî yekîti

MAHMUT KILINÇ



Ji destpêka Têkoşina Neteweyî vir de, pêkanîna yekîtiya neteweyî jî rojevê derneketiye. Ev, ne demeke kurt e; mixabin sed sal in ku tevgera kurd qala yekîtiya neteweyî dike, lê tu caran negihîştîye qonaxa serkeftinê.

Carinan wekî ku yekîti nêzik dibe, bi guman dibe, lê dîsa jî ji ber hinek sedeman naçe serî. Heta hinek caran jî bo hevkarîyê bêhtir di nav partî û hêzên Kurdistanî de gav hatine avêtin, her çiqas wekî enî hatine binavkirin jî, ew bê fonksiyon mane. Hêvîdariya kar û xebateke ku ji van tevgeran hatiye kirin, bi qasî daxwazê pêk nehatiye. Bo mînak, li başûrê Kurdistanê ev deh sal in ku "Bereya Kurdistanê" heye, dîsa jî pirsgrêkên di navbera partî û hêzên Başûr de çareser nebûne. Demeke dirêj şerê navxweyî di cîvaka Kurdistanê de nesekinî û bû sedema rûxandin û xirabiyê herî mezin. Texribata li ser cîvaka Kurdistanê bi dehan salan e nîkarin rakin.

Li bakurê Kurdistanê jî gelek caran di nav

partî û hêzên Bakur de "Tevger" ava bûne, lê wekî Başûr, li vir jî van tevgeran tu berhem nedane û pirsên di navbera tevgera Bakur de çareser nebûne. Her wiha her dem jî hêza herî mezin PKK li derve maye. Bo mînak weka "Hevkarî" û "Tevger" û hwd. Di sala 1993'yan de bi înkirinê agirbesta PKK'ê ya yekalî re, yekemîn car atmosfereke guncan di siyaseta bakurê Kurdistanê de dest pê kir. Pêvajoya ku aj da bi tenê ne di navbera PKK'ê û dewleta tirk de ma. Wê banga aşîyê bi taybetî di navbera hêz û partiyên Bakur de deng da û bû sedema diyalogê û berhemî da. Bi protokola di navbera PKK û PSK'ê de di nav gel de diilxwaziyêke dest pê kir û di demeke geleke kin de hemû partiyên Bakur ketin bin bandora vî diilxwaziyê. Vê dilgeşiyê gelek berhem jî dan: Têvgera Bakur bi hev re gelek kar û bar meşandin. Karekî dîrokî jî "Eniya Neteweyî ya Demokrat a Kurdistanê" bû. Nêzikî sal û nîvekê kar dom kir, partî û hêz gelek caran li hev civiyan, biryar hatin girtin. Heta jî bo eniyê zagona bingeşîn û destûra navxweyî jî hate nivîsandin û li ser wê gotûbêj hatin kirin. Lê belê piştî sal û nîvekê wekî ku ev gavên girîng nehatibin avêtin, ew dîsa li hev civiyan û bi daxuyanîyê hate diyar kirin ku tevgera bakurê Kurdistanê îro jî bo eniyê neteweyî ne amade ye. Daxuyanî bi vî rengî bû, lê belê der barê hinek partiyên de jî kurtepiştî hebûn û di hate gotin ku ew partî ne amade ne. Daxuyanî hatibû

belavkirin, lê enî an platformeke neteweyî tu caran jî rojê gel demaket.

Îro karê ku di sala 1994'an de nivco maye, dest pê kir. Karekî neteweyî û pîroz e. Çend sal derbas bibin jî, tu car yekîtiya neteweyî jî rojê kurdan dernakeve. Yekîtiya neteweyî jî ji bo têkoşina gelê kurd pêdiviyêke wekî av û nan e. Heta ev gav neyê avêtin, li dinyayê têkoşina neteweyî bi qasî ku heq kiriye nayê pejirandin. Mezin û biçûk her rêxistin, divê bi qasî teqata xwe ked bide û berpirs be. Mesûliyêke wê hebe. Heqê kesî tune ku peyva "min got nehat" bes bibîne, her wiha divê kes nebêje "hêza mezin mecbûrî min e, divê hemû daxwazên min werin pejirandin." Yekîtiya neteweyî li ser fedakariyê geş dibe. Li aliyê din jî di kar û xebatên siyasî de tu car hemû rê û rêçik nayên girtin, siyasatmedar divê rê û rêçikan bibîne.

Ji bo partî û hêzan şertê fedakariyê ye yekemîn ev e ku rêxistin berjewendiyên gel di ser yên rêxistina xwe re bigirin. Rêxistin û rêber jî bo azadiya gel pêwîst in, lewre jî divê pêşî li berjewendiyên gel bifikirin.

Karê bo Platformeke Neteweyî di nav gel de bûye sedema kêfxweşiyê. Îro pênc partî li hev dicivin, du hêzên din jî dixwazin beşdar bibin. Niha PDK'a Bakur li derve maye, gel dixwaze ew jî beşdar bibe, lewre mercên jî bo eniyê neteweyî hene. Serkeftin jî bi kesekî na, hevkarîyê pêk tîne. Yekîti dê rîya serkeftinê jî li ber gelê kurd vebike.

Hemgovendê êgir û Zerdeşt:

Ali Aydın

Erê Hevalê Elî, ev çend sal bûn ku te bi me re dilan digerland. Lê zîndan ji dilana te re teng dihat. Te dil kir ku tu bi êgir re dilanê bigerin û bi pêtên êgir re derkevî serê Çiyayên Araratê, li wir dilanê geş bikî.

Heval, tu di jiyane de pir bi heyecan û xwîngerm bûyî. Te xwe tu caran ji kar û xizmetê nedida paş. Xweş tê bîra min, berî çalakiyê bi rojekê, te ji hevlekî re wisa gotibû: "Xizmeta bo hevalan, xizmeta bo Partiyê ye." Di vê dema dawiyê tu pir guherîbûyî. Lewre te tim û tim şerê şeytanê nav xwe dikir. Te ev yek di rojnivîska (günce) xwe de wiha nivîsibû: "Ez bi şeytanê nava xwe re şerekî giran û dijwar dimeşînim. Divê ez wî bikujim."

Hevalê Elî piştî çalakiya Hevalê Murat te nişaneyên çalakiya xwe dabûn xuyakirin lê me fêhmekir. Te gotibû: "Ez dê çawa layiqî wan bibim? Wê ev çalakî bidomin." Hevalê Murat bi çalakiya xwe ji bo me silava Rojbaşê hilda û te ji bi çalakiya xwe fermana ketina nava jiyane da me. Em bi

çalakiya Hevalê Murat ji tamara xewê hişyar bûn, bi çalakiya te jî em ketin nav xebatê. Laşê me lerizî, rîfêk li me peyda bû, aveke keli bi ser laşê me de dageriya. Deng ji me

dernediket. Çalakiya te di nava me de wekî bombeyekê teqiya.

Nameyên ku te nivîsibûn gelekî bi dilgermî û jidil bûn. Her wiha bi dilsojî hatibûn nivîsîn. Mirov digot qey bi pêta êgir hatine honandin. Dil û cegerê mirov dianî xwarê. Te di nameyekê bo Serok de wiha nivîsibû: "Serokê min! Min pir dixwest te bi çavên serê xwe bibînim. Lê yê nadin gelek in. Ji ber vê çendê ez dê van astengiyan ji holê hildim."

Heval, te digot em dê bi têkoşina


çekdarî doza xwe bibin serî. Lewre te pê dizanî ku wê gerila Roja me biparêze. Te ji bo Serokê Neteweyî, gerila, gel û hevalên li zîndanên name nivîsibûn. Te di nameya bo Artêşa Rizgariyê de wiha nivîsibû:

"Divê em pêşiya vî şerê qirêjê ku li dijî ronahiya me Serokê Apo û gelê me tê gerandin bigirin. Ez bawer im hûn dê vê yekê pêk bînin. Ez dê mîna hevlekî we vê yekê bikim. Ez mîna we ne xwedî çek im, lê ez dê bi bedena xwe bersivê bidim vî şerê qirêjê."

FAYSAL ÖZDEMİR

/GIRTÎGEHA

BARTIN



Ali Aydın

Ali Aydın û Murat Kaya di meha sermaweza sala 1998'an de li Girtîgeha Bartînê ji bo şermazarkirina komploya li dijî Serokê Giştî yê PKK'ê A. Öcalan agir berda bedena xwe û wan jiyana xwe ji dest da.

Murat Kaya

Silav li Tîrêjên Rojê ...!

Zerdeştê Kal gotibû: "Agir mirov nakuje. Iblîsê di Znav êgir de mirov dikuje. Agir nava mirov paqij dike." İro careke din lawên êgir xwe bi êgir dişon û welêt ronîdar dikin.

Ere! Ev gotin beriya niha bi 2500 salî hatibû gotin. Lê gelek kesan ev gotin ji bîra kiribû. Bes bi Tevgera Medî a Hemdem ya di bin rêbertiya Zerdeştê Hemdem de careke din vejîya. Careke din Welatê Rojê bi agirê Zerdeşt hate xemilandin, piştî tariyeke kûr û giran.

Roja 20 sermawezê. Li ezmanê welatê min ewrên reş rabûbûn. Hilûyan di nava ewran de baskên xwe lê didan. Lê zîndan... Di vê rojê de agirekî Medî li Zîndana Bartînê de çirûsk avêtin, zîndana reş ronî kir. Bi alavên êgir "Hûn nikarin roja me bêtav bihêlin" hate nivîsîn. Belê roja 20'ê sermawezê, bû roja Hevalê Ali Aydın. Dîrok, wê dîrok her dem vê rojê bi serbilindî û şanazî pêşkêşî gelan bike.

Hevalê Elî! Te jî mîna hevalên xwe zû pêvajoyê fêhm kir û bagirê ku Hevalê Halit pêxistibû, bi bedena xwe geş kir. Her wiha ne yek, ne dudo, her roj agir û stêrk geş bû, ji zîndanên Kurdistan, Tîrkiye û Ewropayê. Hûn bûn 21 xelek li dora Serokatîyê. Hûn ji Rojê hatin û careke din herikîn ber bi Rojê. Hûn li dora Rojê

civîyan û bûn tîrêjên Rojê di zikê tariyê de.

Hey Şervanên Rojê! We destana êgir bi êgir nivîsî û li asîmana Mezopotamyayê berz û bilind kir. Ji bo têkoşîn û serfiraziya gelan, hûn bûn Manifestoya ser-

Ey Destanên Rojê... Birûskên payîzê. Agirê we ji Rojê bû. Baskên we jî ji êgir bûn... Hûn bi alavên ji êgir li dora Rojê firiyan. We hilma xwe ya dawî bi êgir kişand nav kezabên xwe û we wisa Rojê hembêz kir.

firazi, têkoşîn û berxwedanê. Hevalê Elî tu pirtûkê bûyî, ku her roj were xwendin û şîrovekirin. Ji bo ku em kêmasiyên xwe bibînin, tu bûyî neynikek. Tu pirtûka jiyana şoreşgeran, jiyana azad û serketî. Tu bûyî hêza pêxistin û berzîkirina şerê navxweyî, ji bo lidarxistina serkeftina li dijî neyaran.

Lawê Ararat Heval Elî, te jî mîna Semayan serhil-

dana dilê Ararat li dijî neyar bi agirê dilê xwe derxist. Te nehişt ku kes deryaya me bimiçiqîne. Te got: "PKK deryayek e. Dixwazin vê deryayê bimiçiqînin. Ez jî dixwazim xwe feda bikim." Bi rastî te cihê di nav deryayê de girt û ew parast. Soza te ji bo me hemûyan bû ferman.

Ey Tîrêjên Rojê! Hûn her yek bi serê xwe ji bo me pirtûka pêşerojê ne. Hûn bo jiyana me ferman in û Tîrêjên Rojê ne. Roja me bi we tê parastin û gelê me bi pêşengiya we bingeha dewletbûnê di zikê dîrokê de kûr û xurt dike.

Ey Agirên Şevê! Destanên Rojê... Birûskên payîzê. Hûn bêtirs li pey hev meşîyan 7 stêrk. Agirê we ji Rojê bû. Baskên we jî ji êgir bûn... Ji dîr ve xuya kir Tîrêjên Roja me. Hûn bi alavên ji êgir li dora Rojê firiyan. We hilma xwe ya dawî bi êgir kişand nav kezabên xwe û we wisa Rojê hembêz kir.

Em jî silavê li we hildidin hevalên rûagir, şehîdên demê; Halil, Ali, Mehmet, Bülent, Mirza, Aynur, Selamet û Hesên, İsa, Hesên...

EHMED HUSEYİN-YAHYA KANDEMİR

GIRTÎGEHA BARTINÊ

□ Rêbendan 1919:

Roza Luksemburg ji aliyê faşîstan ve hate kuştin

Roza Luksemburg li Polonyayê hate dinê. Ji destpêka civantîya xwe de li dijî faşîzmê di nav çalakiyên sosyalîst de cih girt. Di gelek rêxistinên di vî rîyê re endamti û serkêşî kir. Ji ber ku di teqîba polîsî da bû di 1889'an de ji Polonyayê veqetiya. Roza Luksemburg û Karl Liebknecht di sala 1919'an de ji aliyê faşîstên alman ve hatin kuştin.

BÛYERINE JI DÎROKÊ



□ 11.01.1997:

Kongreya yekemîn a YRK'ê pêk hat

Yekîtiya Rojnamevanên Kurdistanê (YRK) kongreya xwe ya yekemîn pêk anî. Ev kongreya yekemîn bi beşdarbûna 80 rojnamevanên kurd li Kolnê çêbû. Tuncay Doğan, Rîza Doğan, Yusuf Cacım, Ali Özşerik, Ethem Söylemez, Ahmet Karakaya, Ali Can wekî kargerîya nû hatin hilbijartin. Bi dî re wekî serokê YRK'ê Cahit Mervan hate hilbijartin.

Ji rewşenbîrên Ewropa bo Öcalan piştgirî

Dario Fo: Öcalan mafdar e

Piştî çûna Serokê PKK'ê bo Îtalyayê gelek parlamenter, serokwezîr, nivîskar, rewşenbîr, hunermend û kesayetiyên Ewropa piştgirî da Öcalan. Di hefteya derbasbûyî de xelatgirê Nobelê yê Edebiyatê û nivîskarê Îtalî jî, bi daxuyanîyê piştgirî da Öcalan.

'Divê pirsgirêka kurd çareser bibe'


Nivîskarê bi nav û deng Dario Fo, ji welatên Ewropa xwest ku pirsgirêka kurdan çareser bikin. Dario Fo ji bo çareserkirina pirsgirêka kurdan ev pêşniyar kir: "Öcalan mafdar e. Yanê Ewropa pêwîst e bi kurd û tirkên re rûne ve pirsgirêkê bi riyeke siyasî çareser bike. Gelê kurd jî, dixwaze ev pirsgirêk were çareser kirin, ji ber ku êdî wisa nameşe. Mafê jiyane yê kurd jî, heye pêwîst e em vê jî bîr nekin."

Dario Fo di rojnameyêke Îtalî de jî ev ditin anî zimên. Wî got "Bûyerên ku niha diqewimin ez baş dizanim. Bi gelek nivîskarên kurd re têkiliya min heye. Ev nivîskar di warê edebiyat û çandê de xebatên girîng bi rê ve dibin. Lê belê gelek ji van di girtîgehê Tirkiyeyê de ne."

Nivîskarê Îtalî bal kişand ser şerê ku li Kurdistanê dimeşe û got; "Di van salên dawî de li Kurdistanê gelek rewşenbîr, nivîskar hatin qetilkirin. Bi van re gelek mirovên sivil jî hatin kuştin. Lê belê sed mixabin ev bûyer li cihanê belav nebûn."

Dario Fo li ser hatina Öcalan a Romayê jî wiha got: "Ez bawer im pirsgirêka Öcalan ê di demeke kin de were çareser kirin. Mixabin tu kes li ser dîroka kurdan nîqaş nake. Hebûna Serokê Giştî yê PKK'ê li Romayê, gelê kurd dide naskirin. Bi rastî jî, dîroka gelê kurd jî ya gelê Îtalî kûrtir e."

Dario Fo, di pirsgirêka kurd de rola Öcalan bi bîr xist û got: "Mafê gelekî di xetereyê de ye. Pêwîst e em vê jî bîr nekin. Berjewendiyên aborî



divê nekevin pêş hebûna neteweyekî. Pêwîst e Ewropa berpirsariya xwe bizanibe. Ji ber ku gelê kurd piştî şerê cihanê yê yekemîn hat parçe kirin."

Dario Fo kî ye?


Xelatgirê Nobelê yê sala 1997'an Dario Fo, di nivîs û berhemen xwe de sistemen cihanê rexne dike. Vê pirsgirêkê bi taybetî di pirtûka xwe ya bi navê "Klakson, Borazan" de bi şeweyekî tîne zimên. Dario Fo, di pirtûka xwe (Piştî re ev bû şano jî) ya bi navê "Di encama qezeyekê de mirina anarşîstekî" de jî, têkiliya dewlet û mafiyayê diniwîsîne.

Dario Fo, di sala 1926'an de li bajarê Îtalya Leggioni-sangiama tê dinê. Bi hevala xwe re komeke şanoyê ku girêdayî Partiya Komunîst a Îtalyayê ye di 1968'an de ava dike. Di sala 1970'yî de jî, bi navê "Şanoya Gel" komeke din jî, ava dikin.

PERWER BENGÎ /ALMANYA

ÇAVDÊRÎ

Sersala we pîroz be



SERKAN BRÛSK

Sersal xwe nûkirin e. Ji nû ve xwe afirandin û avakirin e. Yanî çêbûn e. Yan jî ez wiha fêm dikim. Çêbûn e ya ku em wek takekes, tevger û netewe dixwazin li ser beden û giyana xwe ferz bikin û bi awayekî şoreşgerane wê di jiyana xwe de pêk binin û himê stîlê jiyana xwe ya pêşerojê wiha lê bikin. Çêbûn e ya ku em xwe bi gorîkirina di ber wê de dixwazin wê di dilê Cûdiyê ku bedenê azadiyê pêk tîne de, wekî şitlekî bihara neteweyî şîn bikin. Çêbûn e ya ku em dixwazin mirina xwe ya bi navê nasnameyê bi wê bidin fetisandin.

Mirin e ya ku em êdî nema dixwazin ew wekî zebaniyê dojehê nasnameya me bi agirê mijokdariyê di dawîya sedsala bîstan de ji kêfa dilê xwe re bişewitîne. Mirin e ya ku em dixwazin wê bi şîrêza giyana xwe jehrdiyê bikin û li şûna wê çêbûna xwe ya gelî û neteweyî di sedsala bîst û yekê de li nava erdê Kurdistanê ku di her çar pirtûkên mezin ên dîni de wek bihuştê hatiye qebûl kirin kesk û şîn bikin.

Ger me jiyane xwe yê ciwan xemilandibin û ji zihayê tunekirinê re ku di devê çavkaniya jiyana me de mexel ketibe wekî goriyan bi kesertîyê û axîni diyarî dabe, tenê ji bo vekirina rîya ava ku dê gulîstana me bi kulîlken jiyane bixemilîne ye. Dîsa ger destên dê û bavan, kalik û dapîrên me ji êşan re di kelên wan de, xosiyên wan jî di gewriyên wan de asê mabin û bêhna wan nema di nava kezebên wan de hilatibe û di dilê wan de janê berê ji can û bedenên wan tevî ya mal û milkên wan bûbe, tenê û tenê ji bo çûbûna te warî ye. Tevî ev qasî êş û janên ku di bedenên me de şax dane jî, em dîsa jî bi rîkanî bi navê te sond dixwin û azadiya te hîn jî sonda me ya herî pîroz û asê ye. Lê em çi bikin demê şîrê gur mêtîye, xayintîya marê kor girtîye, peymana xwe girêdaye bi çêlkewan re ku li ser rûhê cînsên xwe dixwînin û şewra xwe jî bi roviyan re daniye..

Em baş dizanim ku tenê bi dubarekirin û çendbarekirina peyvê tu çênabî û mirina te jî betal nabe, ey çêbûn. Ger tu bi peyvên û duayan çêbûbûya, heta mû bi zimanê min ve şîn çêbûya û dîsa heta ferîştayên li ber dilê Yezdanê dilovan şêrîn in bi guh bûbûna, min ê bikira hewar û qêrîn. Heta darên çarmîxa hezretê Mesîh di erdê de kok berdana û di şûna mixên ku di kefen destên wî de hatine çikandin de pêûsa ku pê peymana azadî û wekhevîyan tê nivîsandin pêk bihata, min ê xwe berzûrî te bikira... Ev du hezar sal in ku hîna jî xwîn ji şûna mixên ku di kêfa dest û binê piyên lawê te de hatine vekirin dipale. Hîna jî lawê te bi van bîrnan dinale. Hîna jî hewara Hawariyên wî li deşt, nawal û çîyayên Mezopotamyayê belav dibê.

Papa bi berikên dijmînên jiyana min û hemû komikên bi halê min derbasî vê sala dawî ya sedsala bîstan dibê. Bi vî êşê duayan dike, ji bo çêbûnan. Ew dizane ku min bi dehan caran rûyên xwe daye ber sileyên, lê tu tişt jî vî fêm nekirin, van bêbavên çavsor. Wan her hejandin şêrên xwe yê bi xwîna gelan rengesor.

Dîsa jî em dixwazin bi hevî li deriyê vî salê bidin. Em dixwazin ku êdî xwîn ji giyana azadiyan neniqute. Em hevî dikin ku ev sala nû ji bo hemû derdên takekesan, civakan û gelan bibe dermanê derdan.. Bila sedsala pêşîya me ji bo gelê me bibe sadsala çêbûnê. Bila mirovên me cejna xwe ya gelî di bîst û yekê adaran de bi çofi pîroz bikin. Bi van derd, xem, metirsi, hevî û bawerîyan bi rojên ronî sersala we ya nû pîroz be.

Ji rewşenbîrên kurd bo d'alema name

Rewşenbîrên kurd ên ku navê wan li jêr derbas dibê ji bo ku mafê rûniştinê yê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bê pesend kirin name ji Serokwezîrê Îtalya Massimo D'alema re sand:

Ahmet Huseynî-Helbestvan
Ali Çiftçi-Weşanger
Beser Şahîn-Hozan
Celadet Çeliker-Nivîskar
Cemil Gündoğan-Nivîskar
Firat Cewerî-Nivîskar
Gulistan Perwer-Hozan
Hanîfî Celeplî-Weşanger
Haydar Diljen-Nivîskar
Jafar Hasanpur-Peywîrdarê lîkolînê
Mahmûd Lewendî-Nivîskar
Marîna Taloyan-Sosyolog
Omar Şêxmûs-Peywîrdarê perwerdehiyê û lîkolînê

Nasir Rezazî-Hunermend
Osman Aytar-Nivîskar
Reşo Zilan-Zimanzan
Rohat Alakom-Nivîskar û Lîkolîner
Sabiha Diljen-Mamoste
Salim Çeliker-Nivîskar
Seid Molla-Polîtîkvan
Şivan Perwer-Ozan
Siracettin-Polîtîkvan
Zinarê Xamo-Nivîskar


Her wiha rewşenbîrên kurd heman name ji van kes û cihan re jî sand: Hemû serokên Ewropaya Rojhilat û Rojava; Serok û Serokwezîrên DYA, Kanada û Japonya; Serokê Serdemî yê Yekîtiya Ewropayê; Sekreterê Giştî yê NY; Sekreterê Giştî yê NATO; Konseya Ewropayê, Papa, Serokê Xaçê Sor; Rêxistina Efûyê, Medico Internationale; Kulûba Penê; Yakîtiya Nivîskaran a hemû dewletan; Çapemenî.

SERWISA ÇANDÊ

Rewşenbîr û siyasetmedarên Kurdistanî li ser Kongreya

Mesele ne meseleya partiye

Kurdistanî bi her awayî di demeke dîrokî re derbas dibin. Yek ji nîşaneyê ve yekê xebatên bo danîna Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê ye. Wekî tê zanîn Komîteya Amadekar a Kongreya Neteweyî roja 19-20'ê berfanbarê sala 1998'an li Brukselê Konferansê saz kir. Hevalê me **Î. CAN DILBIRÎN** li ser armanc û pêwîstiya Kongreya Neteweyî û helwesta rêxistinên ku beşdarî Kongreyê nabin, bi hinek siyasetmedar û rewşenbîrên Kurdistanî re axivî.



NIVÎSKAR EYÛP BARZANÎ (BIRAZIYÊ MISTEFA BARZANÎ):

Ez dixwazim hûn pîrsa li ser helwesta PDK'ê ji rêveberên wê bikin. Lê niha du tişt hene. Malbata Barzanî yanî Barzan, bi xwe wekî mejû ango dîrok heye. PDK ji ber çî nehate konferansê, bi rastî jî pê nizamim. Lê dibe ku ji ber Tîrkiye nehatibe. Ew Peymana Wahingtonê heye û tê de PKK'ê wekî dost nahesibîne. Dibe ku ji ber vê yekê jî be. Lê esas jî ber helwesta Tîrkiyeyê nehatiye.

Niha kêşeya esas ev e. Em naxwazin ev ên ku niha rêvebir ango serokatiya PDK'ê ne, vî karî bikin. Em navên ku eynî qîmetî bidin, van ên ku ligel generalê tirkan li dijî Kurdistanê cih digrin. Ên berê ligel Sedam û li dijî tevgerên kurd cihên xwe nedigirtin. Ev helwesta wan tiştê nû ye û pir kes jî pê nexweş in. Ez bi xwe gelekî pê nexweş im. Yanî tarîxa me ya kevin qut dibe, ji ber ku ev li dijî dîroka me ya qedîm derdikeve. Çaxê te destê xwe da destên dijminê xwe, mirov hemû rumetên dîrokê bêqîmet dîke. Mixabin... Mixabin...!

Li layê din divê demokrasî hebe da ku her partî û rêxiraw bête beşdarî kongreyê bibe, daxwaz û rexneyên xwe bibêje. Divê werin û vekirî van tiştan bibêjin. Eger giliyên we hene, fermo bidin dengdanê. Bila nêrîna min û te yek nebe lê ew nayê wê maneyê ku em bibin dijminê hevudin. Gotineke Kurdî heye dibêje: "Gul nebe dara dirik nabe"

Bi rastî belkî ev yekem car e ez tiştê wî hiha dibînim ku herkes yanî kî dibe bila bibe, nêrîn, rexne û pêşniyazên xwe bêguman dibêje. Her kes bi serbestî dikare ya dilê xwe bibêje. Dîtinên wekî; ev kongreya PKK'ê ye, bi dîtina min tiştê herî şaş û xelet e. Niha rêxistinên kurdan di nava mercên dijwar de ne. Dibe ku hemû wekî hev nebin. Ev tiştê kî siruştî ye. Lê divê deriyê tîkîlî û diyalogê negirin. Dema em wisa bikin, doza me naçe serî.

MUSTEFA ŞALMAŞIN KEVNEBERPIRSÊ PDK:

Rêxistinên beşdarî xebata bo danîna Kongreya Neteweyî nabin, her yek delîlekê nîşan didin. Hinek dibêjin karê me heye. Bi taybetî PDK'ê Başûrê Mezin jî ber ku PKK tê de cih digire beşdar nabe. Ji bo PDK'ê Îranê rewş diyar e, wan jî bo tevî nebûnê izra xwe xwestin. Divê ew jî hewl bidin ku cihê xwe di nav Kongreya Neteweyî de bigirin. Lê berî ku Kongreya Neteweyî were danîn, divê şerê di navbera kurdan de were rawestandî. Nexwe ne mimkûn e ku ew herdu parçên Kurdistan beşdar bibin.

Di nava rêxistinên kurdan de dîtinên cuda hene. Lê tevî van hemû raman û dîtinan baweriya min heye ku feyda her yekê jî bo azadiya welat başî tê de heye.

Niha du helwestên mezin, ji bo çareserkirina kêşeya kurd hene. Yek xeta Ewropa ye, yek jî ya Amerîkayê ye.

Helwesta Ewropayê bi taybetî bi hatine birêz Ocalan re kete rojevê. Lê bi giranî li ser bakurê Kurdistanê ye. Em hêvî dikin ku ji bo tevahiya Kurdistanê polîtîkaya xwe bimeşîne.

Helwesta Amerîkayê jî bi Peymana Washingtonê diyar bû. Em hêvîdar in ku ev konferans her du biryar û mebestan bike yek, da ku ji bo çareseriya doza Kurdistanê bibe karekî pîroz. Barê giran li ser milên van kesên ku hatine beşdarî vê Konferansê bûne ye.

MESUT UYSAL (ENDAMÊ PKDW):


Partî û kesên ku beşdarî Kongreya Neteweyî nabin, dibêjin: "Dema avakirina Kongreya Neteweyî nehatiye." Heta dibêjin ne pêwîst e. Bi taybetî PDK'ê Başûrê Mezin, ew bixwe jî nayê û nexwaze kes jî beşdar bibe. Têkiliya me bi PDK'ê Rojhilat re heye lê wan jî hinek mazeret dane pêş û nehatinê ve konferansê. Her kes dixwaze ku ji bo çareseriya kêşeya kurd kongreyê bê danîn û lewre dibêjin Kongreya Neteweyî ji bo kurdan re şert e. Ji ber ku rîya yekîtiya kurdan di danîna kongreyê re dibore. Ji bo nûnertiya gelê kurd jî, dîsa kongre pêwîst e. Dibe ku hemû kes wekî hevudin nefikirin. Jixwe rastî bi nîqaşa dîtin û ramanan derdikeve holê. Hebe tunebe hin kes dê li dijî hev derkevin û wê sazî û rêxistinên fikra wan cuda hebin.

Bi dîtina min tiştê herî girîng ew e ku ji kurdan re kongreyê pêwîst e, da ku nûnerên gelê kurd jî bikaribin di qada navneteweyî de, ji gelê xwe re nûnertiya bikin. Niha welatên ewrûpî dixwazin ji bo ku Kêşeya Kurd were çareserkirin konferansê navneteweyî saz bike. Vêga jî bo ku kurd bikaribin nûnerên xwe bişînin û konferansê, pêwîst e Kongreya Neteweyî were danîn. Ger ev neyê damezrandin, wê çawa çêbibe, ma her partî, rêxistin û şexs

wê herin xwe temsîl bikin? Ev partiyên biçûk wê çiqas bikaribin kurdan temsîl bikin. Ya herî girîng pêwîst e saziyek hebe, da ku hemû kurdan û Kurdistanê di qada navneteweyî de temsîl bike.

Niha dewleta tirk dixwaze hin kesên ku endamê meclîsa tirk in, wekî nûnerê kurdan nîşan bide. Lê em vê dibêjin; ji bilî mirovên êşkere xayintiyê dikin, her kurd û Kurdistanî dikare beşdarî vê kongreyê bibe. Nêrînên xwe neyînî û erênî dikarin bibêjin. Dibe ku nêrîna wan li ba me neyînî yan jî nêrîna me li ba wan neyînî be. Bila werin û nêrînên xwe bibêjin. Em dê pir kêfxweş bibin. Ew ên ku xwe kurd qebûl bikin lê belê ne ku tirk wan bi rê bikin.

Dawiyê ez dibêjim ji îro bêhtir tu rojên dijwar bi ser kurdan de nayên. Ger îro neyên û axaftinekê jî bo kurdan nekin, îro jî bo kurdan dest nehilînin, îro di nava kurdan de yekîtiyê pêk neyînin, gelo wê kengê pêk bînin? Îro tevahiya cihanê li ser maxdûriyeta kurdan kom dibe, kurd ketine rojeva cihanê.



weyî axivîn

ê ye ya miletekî ye

ŞAIF BEDIRXAN
(JI MALBATA BEDIRXANIYAN)

Di dîroka me kurdan de, yekem car e ku em dikarin gelek komên cur bi cur yên gel, rêxistin û partiyên siyasî li hev bicivînin û bibin dengê gelê kurd.

Bi taybetî ji wan rêxistinên ku îro li vê derê tune ne re dibêjim. Ji bo ku em bikaribin di nava hevkarî û yekîtiyê de bixebitin, hêviya min ew e ku di dema pêş de tevî kongreya neteweya kurd bibin.

Hatina Serok Apo ya Îtalyayê ji bo hemû rêxistinên kurd ên siyasî û dîplomasiya kurdan gaveke mezin e. Ez bawer im Serok Apo wê roleke mezin ji bo hemû parçeyên Kurdistanê bilîze. Piştê jî karê herî mezin û giran dikeve ser Kongreya Neteweyî. Divê rolê xwe di nav rêxistinên kurdan de baş bilîze. Her wiha ne tenê yên li herêmekê, li hemû cîhanê nûnerîtiya gelê kurd bike. Li aliyê din kurdên ku li Amerîkayê dijîn, em hemû piştgirî didin Serok Apo û hatina wî ya bo Îtalyayê. Her wiha me ji bo ku statuya siyasî bidinê Öcalan meşek pêk anî. Dîsa me name ji bo vê meselê ji serokdewlet, serokwezîr û wezîrê karê hundir yên Îtalyayê re şand û me diyar kir ku em piştgiriya Serok dikin. Dîsa em dil dikin li Amerîkayê xebateke berfireh pêk bînin, da ku Amerîka di warê çareseriyê pirsê me kurdan de tekeve nav hewldanên bo çareseriyê Kêşeya Kurd.



* Parêzer Salih Şahîn

Ev xebat hinekî bi derengî pêk hat. Ji bo gel û her wiha hatina Serokê Giştî yê PKK'ê ya bo hate Ewropayê, wisa xuya ye em dereg mane.

Ev tiştêkî pir girîng û acil e. Wekî diyar e hin rêxistin û partî ji kongreyê xwe didin alî. Neteweyetî ne girêdayî rêxistinekê yan jî şexsekî ye. Neteweyetî girêdayî îdeolojîyê ye. Partiyek û gel jî dikare bi tena serê xwe bibe netew. A niha kes li vê derê ne pismamê kesî ye. Ji her çar beşên Kurdistanê mirovên rewşenbîr û siyasîmedar hene. Kî dikare bibêje ev platform nikare gel temsîl bike. Li vir jî Hewlêrê, Mehabadê ji Semsûrê, Gurgumê, Amedê û ji her çar aliyên Kurdistanê mirov hene û hemû jî kesên welatparêz in. Her wiha li vê derê kesên dinê xwe cihê, siyasî û îdeolojîyên xwe cihê hene. Netewe ev e.

Hêvîdar im ger ev konferans karê xwe baş bike, bibe bingeha dewleta Kurdistanê.

* Hikmet Serbilind, Partiya Îslamî ya Kurdistanê PÎK (Axaftina wî ya di konferansê de)

"Kurdistan îro ji aliyê çar welatên îslamî ve hatiye parçekirin. Ji bo ku em bikaribin yekîtiyê xurt ava bikin û di Yekîtiya Neteweyan de cihê xwe bigrin, divê em

dest ji dema borî berdin û xwe biguherînin. Yanî em mejiyên xwe bikin yek û li dijî zordariya li ser welatê xwe têkoşîna xwe berdewam bikin." Ji bo Kongreya Neteweyî em wekî Partiya Îslamî ya Kurdistanê, her dem amade ne ku bo Kurdistanê azad têbikoşin.

* Nûnerê Asûrî-Suryaniyan Pîtros Karatay:

Ev pêvajoyê, pir girîng e. Divê teqez kurd vê baş binirxînin û jê feydê bistînin. Pêkanîna kongreyê neteweyî di roja îro de ji her demê pêwîstir e. Beriya bihata çêkirinê belkî evqasî girîng nedihate dîtin. Lê encamên vê xebatê jî wê derkevîne holê.

Bêguman di nava vê yekîtiyê de gelê asûrî-sûryani jî, wê cihê xwe bigre û jê sûdê bigire. Yekîtiya kurdan û çareseriyê ku li heremê çêbibe, wê di aliyê başiyê de bandora xwe li gelê me jî bike. Lewre ev kongre ji bo me jî gelekî girîng e.

Kes û rêxistinên ku doza neteweyetiyê dikin, ne mimkûn e ku ji vê kongreyê birevin, Teqez divê tevî bibin. Bêguman, hinek pevçûn, nexweşî û alozî dibe ku derketibin, lê divê êdî mirov doza wan neke.

Em dê heta dawiyê di nava kongreyê de cihê xwe bigirin. Her wiha di vî warî çî karûbarê bikeve ser milên me jî, em hazir in ku pêk bînin.

DR. MAHMUD OSMAN SIYASETMEDAR

Bi raya min, ev xebat ji ber du sebaan pir girîng e.

Yek; bi hatina Birêz Öcalan a bo Romayê diyar bû ku mesele ne tenê PKK'ê û kurdên Tirkîyeyê ye. Kurdên li hemû parçeyên din he ta kurdên Sovyetistanê jî hatine li vir kom bûne. Dudo; ev civîn ji bo Kongreya Neteweyî û baştir hevnaşîna kurdan muhîm e.

Ev yek, danûstandina kurdan xurtir dike û lewre jî îspat dike ku xebata me neteweyî ye. Ne ev parçe û ew parçe ye. Ji bo pêkhatina Kongreya Neteweyî jî, zorê dide ku zû pêk were.

Li layê din hin hêz û partî jî vê xebatê xwe didin paş. Diyar e PDK ji ber Tirkîyeyê beşdar nabe. Lê ev tiştêkî çewt e. Bi raya min divê werin, lê mixabin niha di navbera wan û PKK'ê de şer heye, dibe ku hinek ji ber vê jî be. Lê belê, ew ên dîtir wekî Partiya Sosyalîstên Kurdistan yanî Kemal Burkay, Demokratî Îran û Yekîti Nîştîman. Divê ev Komîta Amadekar xebatê bike, da ku wan partiyên jî tevî kongreyê bike. Heta niha xebat zêde nehatiye kirin. Ji ber ku ew bi xwe ji bo Kongreya Neteweyî hinek sist in. Ez hêvîdar im ku PDK aloziyên di navbera xwe û PKK'ê de, ji bo yekîtiya neteweyî çareser bike. Rast e, têkiliya wê bi Tirkîyeyê re heye lê divê em xebatê bikin, da ku em wan careke din werînin.

Rast e. Hindek kes û rêxistin dibêjin ev kongreya PKK'ê ye lewre beşdar nabin. Berî hatina Öcalan bo Romayê hinekî mafê wan hebû bêtir; PKK îdare dike û bi rêve dibe. Lê îro tiştêkî din e. Piştî hatina Öcalan bo çareseriyê Meseleya Kurd behsa konferansekê cîhanî tê kirin. Ji ber vê çendê ew tiştên berê neman. Mesele ne PKK û ne jî Öcalan e. Rast e bi rêberiyê wan hatiye pê. Lê îro bûye meseleya tevahiya kurdan. Dinya behs dike. Ewropa pir li ser disekine. Li gorî nêrîna min yê ku berê wiha gotiye, divê îro wê nebêje, îro dem ew e ku bifikire. Eger em hemû ji bo xwe bi hev re xebatê nekin, wê dîsa ew kêşeya me diçe ber destê Tirkîye, Îran, Iraq û Sûriyeyê.

Wekî pê te zanin welatên ewrûpî dil dikin bo çareseriyê Kêşeya Kurd konferansekê navneteweyî saz bike. Divê kurd kongreyê neteweyî saz bikin û nûnerên gelê Kurd bişînin konferansê. Ne ku her partiyek biçe li gorî xwe bi axive. Eger em bixwazin mesela me çareser bibe, pêwîst e em wekî netewe biçin beşdarî vê civîna navneteweyî bibin. Ew niha ji bo me xala herî girîng e. Jixwe di mesaja Birêz Öcalan a ji bo konferansê hatî de, nivîsiye: "Kongre ji bo me pir pêwîst e." Ew jî dixwaze ku kurd mîna neteweyekê xebatê bikin. Ewropa jî dibêjin; Bila nûnerên we werin cem me da ku em bizanibin ka hûn çî dixwazin.

PDK, YNK, PSK û PYSK ez dibêmin bes e êdî. Bila kes li ser xwîna kurdan hesaban neke. Divê em jî hewl bidin ku wan bînin nava Kongreya Neteweyî. Ji niha piştî 3 mehên din, em dê tiştêkî bikin. Divê em herin cem wan jî, ne tenê nameyan bişînin. Mimkûn e yek neyê du neyên lê ez bawer im ku hemû jî wê werin. Ji ber ku hinek ji wan ne li dijî Kongreyê ne. Divê em herin bi wan re biaxivin û helwesta wan baştir fêhm bikin.

Sê sal derbas bûn, bêyî dengê bilbila xerîbiyê:

Eyşe Şan

Ji roja ku Kurdistan bû çar parçe û parçeyê herî mezin kete destê mêtîngerên tirk, jontirkên faşîst, piştî kuştina bi hezaran kesan û têkşikandina serhildanên gelê kurd, dest bi talankirina nîrxên neteweyî û taybetmendiyên hunerî û çanda me kir; stranên kurdî wergerandin ser zimanê tirkî û ew stran bi melodiyên kurdî xwendin lê ji bo gelê kurd ne ew tama kurdî di wan stranên de ma û ne jî gelê tirk ew stran ji xwe re mal hesaband. Lê ji nava kurdan jî pir kesan li dijî assîmilasyonê serî rakirin û pir zehmetî kişandin. Navê van di dîroka kurdan cihê xwe girt. Yek ji wan jî Eyşe Şan e.

Hunermenda navdar Eyşe Şan, di 18 berfanbara sala 1996'an de piştî ku gelek salên dirêj ji hunera resen a gelê xwe yê bindest re xizmeteke bêwestan kir, li bajarê Îzmîrê çû ber dilovaniya Xwedê. Eyşe Şan ku di nava civata kurdan de bi navên Eysana Kurd, Eyşeşan, Eysana Osman û Aysa Şan tê nasîn, di sala 1938'an de li bajarê Diyarbekirê ji dayik bûye. Malbata wê li Diyarbekirê malbateke mezin û navdar e. Navê diya wê Heciye Xanim e, ji Hacı Mistefa Begên Erzeromê ye. Navê bavê wê jî Osman e, ji eşîreta Cibrî û dengbêjekî navdar bû. Li ser vê Eyşe Şan wiha dibêje: "Xwezî zimanê diwarê mala me ya li Diyarbekirê hebûya û ji me re qala wan şevbûhêrkên dengbêjan bikira. Min di quncikan de li dengbêjan guhdarî dikir. Min wisa guhdarî dikir, ku yekî gazî min bikira, ez ê veciniqiyama. Dengê bavê min yê zîz û xemgîn tesîreke mezin li min kir. Sal diborîn lê dengê wî ji guhê min derdiket."

"Stranbêjî guneh e"

Di nava kurdan de huner mîna kaniya avê bêdawî ye, her tim dizê û çik nabe. Dengbêjên kurd di vê navê de tesîreke mezin li ser hesta huneriya Eyşe Şanê kiriye. Her roj dema dibê şev, diwanxaneya mala wan jî dengbêjên herêmên cur bi cur ên Kurdistanê mişt tîjî dibû. Dengbêjên deng xweş didan ber hev û heya roja din berê sibê bi hev re distirîn. Yê ku ji her kesî dengxweştir û hostatir derdiket, di dawiyê de ji mazûban an jî meclîsê ve xelatek baş distand.

Eyşe Şan di van çaxên biqîmet de bi heval û deste xwîşkên xwe re li piştî deriyê diwanxaneyê li dengê dengbêj û stranbêj gerîdok guhdarî dikir. Carna bi bihîstina dengê wan mest dibû, haya wê jî dinyayê nedîma, dibû Zîn bi Memê Alan re dipeyivî, dibû Xecê li serê Çiyayê Sîpan û Xelatê bi Siyamend re diaxivî. Derwêşê Evdî, Edûlê, Kela Dimdimê mîna rêzefilman di ber çavên wê re derbas dibûn. Keça kurd

Eyşe Şana dengnazik û hunerdost bo cara yekem di nava civata jinan de carna stranên ku ji dengbêjan hîn dibe, distrê. Her kes bi bihîstina dengê wê bi hesret guhdar dimîne û bi vî rengî hunermenda nemir dest bi strîna bo civata kurdan dike. Malbata Eyşe Şan pir oldar bû, lewre her kes bi xwendina Quranê re mijûl dibû. Di nava dengxweşên Quranê de jî dîsa Eyşe Şan dikeve rêza yekê. Lê ew evîndara strana

kurdî ye. Ji destpêka xuyakirina hunera xwe, ji aliyê bav û birayên xwe ve rastî nerazîbûnan tê. Bavê wê stranbêjiyê wekî gunehêki mezin dihesibîne. Ji ber vê hindê bavê wê pêşniyara plaksazan ya ji bo amadekirina kasetekê napejirîne. Lê Eyşe Şan digel zehmetiyan jî li dijî kultura paşverûtiyê li ber xwe dide.

Bûyerek tal di jiyana wê de, ew ji ezîztirîn nas û hevalên xwe dîr xist. Eyşe Şan hê bîst salî bû ku bi xortekî re

zewicî lê ew li hev nehatin. Eyşe Şan piştî vê bûyera tal hate bajarê Entabê û du salan li Radyoya Entabê bi zimanê tirkî stran gotin. Piştî hate Stenbolê, bi zimanê kurdî û tirkî stranên xwe tomar kirin. Lê plaksazan mafê wê yê rastîn nedanê û bi firotina kasetên wê bûn xwediyê her tiştî.

Girîngiya xebat û hunera Eyşe Şan di vir de ye: Di wan salên reş de ku heya zimanê kurdî di nava malan de jî qedexe bû, Eyşe Şan bi zimanê kurdî loriq û stranên kurdî xwendin. Di çaxê ku jin û mîrên kurdan neçar bûn ku kincên kurdewarî ji ber xwe bikin, Eyşe Şan bi kiras û fistanê kurdî li bajarên Kurdistan û Tirkîyeyê derket pêşberî gel û bi dengê xwe yê şilik û nazik evîna ji bo strana kurdî di dilê her kesî de afirand. Ji dijmin qet netirsiya, ji ber ku heta hetayê baweriya wê bi hebûna gelê kurd hebû. Dijmin jî li her derê jê re asteng derxistin. Wê sond xwar ku qet teslîmî xwestekên dijmin nebe û heya dawiyê ev soza xwe bi cih anî. Dilê gelê xwe şa kir, dilê neyaran şewitand.

MÎT'ê ew nerehet dikir

Eyşe Şan li sala 1972'yan çû Almanyayê, li wir keça wê Şehnaz ku ji bo diya xwe her tiştê dinyayê bû, jiyana xwe ji dest da. Piştî vê bûyera tal xemgîniyeke mezin li ser jiyana wê rûnişt û wê demêke dirêj dest ji xebata hunerî kişand. Dema li sala 1979'an çû serdana kurdên başûrê Kurdistanê di gotûbêja ku li radyoya kurdî bi Segvan Ebdulhekîm re saz kir, bi hesreke giran, behsa mirina Şehnazê kir û hêstirên xwe jê re barandin.

Eyşe Şan dema vegeriya Tirkîyeyê jî aliyê MÎT'a tirk ve pir hate nerehetkirin. Ji sala 1979'an heya geşbûna şoreşa bakurê Kurdistanê pir kêmxuya dikir. Piştî reva kurdên başûrê Kurdistanê ji destê Baasiyên xwînmêj kasetek pêşkêşî dostên muzîka kurdî kir û dema mirov li strana "Werin Werin" li ser reşerojî û qedera gelê kurd guhdarî dike. Hêstirên her kesî tîr xwarê. Stranên *Lê lê Bêmal, Lorkê Lorkê, Qederê Yar, Cemîle, Xezal Xezal, Lê lê Ximşê, Kirasê Te Meles e, Yar Meyro, Derdê Hêwîyê* û gelek stranên din bi dengê wê yê xweş di nava gel de belav bûn.

Mixabin di nava me de derdekî giran heye; heya hunermendên me ji nav me koç nekin, em qedrê wan nizanin. Dema Eyşe Şan li xerîbiyê mir, kêmtir ji deh kesan di merasîma veşartina wê de beşdar bûn û heta di rojên dawîya jiyana wê de jî kesî ji rewş û halê wê nepirsî. Rewşa jiyana Eyşe Şanê baş bû lê wê her tim xwe bêkes didît. Eyşe Şan du caran zewicî û du kur û keçên wê hene.

KAQŞAR C. OREMAR/ELMANYA



Ev wêne ji hejmara Nûdemê va 24'an hate wergirtin.

□ Eyşe Şan her çiqas bi stranbêjiya xwe navdar e jî, lê kêmxuya ji jiyana wê ya balkêş û tîr xemgînî dizanin. Ew, ji bo ku karê stranbêjiyê bike, li dijî malbata xwe ya oldar li ber xwe dide. Dema dibe 18 salî, bavê wê bêyî dilê Eyşe Şan, wê bi mîrê du jinan re dizewicîne. Lê li hev nakin, lewre ji hev vediqetin. Eyşe Şanê, her wiha di nava tirkên de jî nav û deng da. Demekê navê wê û Zeki Müren bi hev re tê bilêvkirin. Dema navdar dibe birayên wê û kevne-mêrê wê gefan lê dixwin û dibêjin: "Dest ji vî karî hilîne, nexwe em dê te bikujin." Lê Eyşe Şan bi ya xwe dike. Di sala 1979'an diçe başûrê welêt. Li vê derê bi çoşeke mezin tê pêşwazîkirin. Peyre vedigere Tirkîyeyê û bi karê me-mûrtiyê radibe. Di sala 1989'an de jî teqawîd dibe.

Navenda Çanda Mezopotamiya ya İzmirê

● 09.01.99 şemf:

Guhdarkirina helbestan û gotûbêj- Hüseyin Şahin, saet: 17.00

● 10.01.99 yekşem: Konser: Destek gul ti stranên gel- Ayhan Çolak, saet: 17.00

● 13.01.99 çarşem:

Şahiya Sorsalê: Koma Şengal
Koma Kendal, Dengbêj Beşit
Şaniya Hêvî, Dengê Bazê



YÇKM

● 9.01.99 şemf: "Bila li bafirokê nexin". Lîstikvan: Ozan Bilen, Nur Surer, saet: 16.00

● 10.01.99 yekşem: Bi zînanê hunerê mirov û civak-6

"Bertolt Brecht û Tiyatroya Epik. Pêşkêşvan: Nazîf Uslu, Beşdar: Zeliha Berksoy, saet: 15.00

Navenda Çanda Tohum

● 13.01.99 sêşem: Filmê "Ji bo bavê mirî", saet: 19.00

● 14.01.99 çarşem: Filmê protesto, saet: 19.00

Li Swîsreyê MED-TV bê selika peykê tê temaşekirin

MED-TV cihê TRT-Intê girt



Ji roja 2'yê rêbendanê ve li Swîsreyê MED-TV ketiye nav televîzyonên ku weşana bikablo dikin. Telekoma Swîsreyê li ser zêdebûna kesên ku MED-TV dixwazin, TRT-Int ji nav televîzyonên ku weşana bi kablo dikin derxist û MED-TV xist cihê wê. Vê qewimînê dilê kurd û tirkên demokrat û azadîxwazên li Kantona (eyalet) Basel a Swîsreyê geş kir. Lê Balyozê tirk ê Bernê û derdorên faşîst hêrs bûn. Her wiha serlêdanên provokatîfî yê rojnameya Hürriyet û Balyozxaneyê Tirk a Bernê, ji aliyê Wezîrê Karên Cîvakiyê Baselê ve bi şûn ve hate vegerandin.

Wezîrê Kantona Baselê Karên Sosyal Dr. Ralf Lewin di daxuyaniya ku da de, diyar kir ku MED-TV televîzyoneke çandî ye û got: "Li kantona me du televîzyonên tirk Star û TRT-Intê weşan dikirin. Serlêdana kurd û tirkan a der heqê MED-TV'ê de ji aliyê komîsyona kantonê ve hate nixandî û di encama vê de, di lêkolîna ku me kir de derket holê ku kêma TRT-Intê dikin. Li kantonê hebûna du televîzyonên tirk û ligel ku gelek malbatên kurd li vir dijîn tunebûna televîzyoneke kurd wekî neheqiyekê hate dîtin û li gorî vê me baş dît ku di cihê TRT-INT de MED-TV weşanê bike." Lewin wiha berdewam kir: "Niha jî hinek mirov dixwazin TRT-Int di weşanê de bimîne. Temam wê çaxê tiştê ku em bikin emê di şûna Inter Starê de MED-TV bixin weşanê". Lewin diyar kir ku wê MED-TV teqez di weşanê de bimîne.

Derweyên der heqê MED-TV de negihîştin armanca xwe

Li aliyê din îftirayên Tirkiyeyê yê derheqê


dengê gel MED-TV de negihîştin armanca xwe. Lewin wiha bersiv da îdiayên peywirdarên balyozxaneyê Tirkiyeyê ya Bernê ku MED-TV'yê terorîstiyê sîncard dikin: "MED-TV kanaleke çandî ye. Ev ji bo bajarê me Baselê rengê e." Wî ji bo îftirayan bi vî rengî fikrên xwe wiha vegotin: "Baweriya me bi vê nayê. Parêzvanîya azadiya nûçegirtinê ne tenê ya min, a me hemûyan e". Prof. Heinrich Löffler ku di heman komîsyonê de cih digire jî diyar kir ku ew tu maneyê nadin vê çavnebariyê û wiha got: "Li Baselê du televîzyonên tirk di weşanê de bûn. Niha Televîzyoneke tirk, televîzyoneke kurd di weşanê de ne. Ev di heman wextî de hev kêşeyek e."

Çapemeniya Îsvîçreyê: Baş e ku MED-TV heye

Li aliyê din rojnameyên rojane yê Swîsreyê daxuyand ku weşandina MED-TV ji bo kurdan mafekî demokratîk e û rêveberîya kantonê biryareke rast daye. Televîzyonên Swîsreyê ku xitabî kantonên Almaniyayê dikin BRS 1 û SF 1, di bultenên nûçeyên xwe de û programa taybetî "Rundschau" de mijar anî zimên û wan got: "Televîzyona kurd ku li Tirkiyeyê qedexeyê, ne tenê televîzyona kurd e, di heman katê de xitabî gelê tirk û gelên din ên Kurdistanê jî dike." Van televîzyonan wiha got: "Ev gelên navborî li Swîsreyê jî dijîn. Ev xelet e ku wekî pirsgerîkeke polîtîk bê dîtin. Jixwe Tirkiye ne tenê li Tirkiyeyê, li Ewropayê jî dixwaze bike pirsgerîkeke polîtîk û qedexeyê bike. Hem kurdî li Ewropayê ne qedexeyê jî."

SERWÎSA ÇANDÊ

TÎŞK



Berey Bakur

BEKIR ŞIWANÎ

Maweyê sê sal e wekî rojnamevanê û karmendê televîzyonê kurdî, le nizîkewe agadarî berweçûnê karûbarî Kongreyê Neteweyî Kurdistanî im. Lew maweyê da legel zor siyasetmedar û roşnîbîr û kesayetî niştîmanperwerî kurdî beşdar le kobûnewekan da çîse û basman buwe. Gîftûgoman çî bo televîzyon bûbê û çî bi rojname, hemû le xalî pêwîstî hebûnî organekî neteweyî kurdî da yekeyan girtotewe. Belam emêş be watay ewe nayat ke hemû le ser şewazî damezrandinî organekî lew core kok bûn, eger wa biwaye, ewa emro xawênî Kongreyê Neteweyî debûyîn. Hemîşe bir û boçûn û şewazî çiyawaz hatote arawe. Bêguman wituwêj û danusan, diyardeyekî demokratî dirust e û nişaney hest kirdine be erkî niştîmanî û neteweyî ser şanî layen û kesanî naw komelgay kurdewarî.

Ew babetaney ke ziyatir mayey wituwêj bûn, beşdar nebûnî hendê layenî Kurdistanî buwe. Helbet layene nabeşdarekan biyanûy corawcor bo beşdar nebûn le karubarî Kongreyê Neteweyî da dêninewe ke zor-beyan lay xwêneran aşkira ye, ca çî le ber nakokî xwênawî nêwan layene kurdîyekan bêt, yaxud le ber peywendî ew hêzane bêt be dagîrkerekanî Kurdistan û zilhêzekanî herêmeke û cihanewe. Le beşî zorî danîştinekanî kobûneweyê Kongreyê Neteweyî da, amaje kirawe bo taybetmendî û çiyawazî barûdaxî siyasî û komelawetî nêwan parçekanî Kurdistan. Boçûnekî heye ke delê ber le damezrandinî kongreyekî ser-taserî Kurdistanî, pêwîst dekat le her parçeyekî Kurdistan layenekan le nêwan xoyan da pêk bîn û nakokî û berjewenî teskî partayetî feramoş biken û berjewendî gel bixene seruy hemû pêwerêkewe. Ke em hengawêş serîgirtî pêk hat, ewa ew kate damezrandinî kongre yaxud Encumenî Neteweyî Kurdistan û tenanet Encumenî Asayîşî Kurdistanîş meyser debê. Boçûnekî tîrî beramber bem şewaze heye ke delê her çorê buwe ha kongre rabigeyendrê û hewil bidat bo kokirdineweyê hêzekanî Kurdistan le jêr sayey xoy da.

Belam pêkewtinek ke le kotay salî par û seretay emsal da le ser gorepanî bakurî Kurdistan hate gorê, tay terazû be lay boçûnî yekem da lar dekatowe. Pênc partî karîgerî ser gorepanî serûy Kurdistan, Partî Komonîstî Kurdistan-KKP, Partî Îslamî Kurdistan-PRK û Partî Sosyalîstî Kurdistan-PSK, diway zincîreyekê dîdar û gîftûgo û helsegandinî rewîşî emroy Kurdistan, geştine biryarî damezrandinî organekî be nawî Platformî Neteweyî Bakurî Kurdistan-PNBK. Le mêj bû deng hebû û dawa dekara ke wa kat hatiwe hemû partekanî bakurî Kurdistan le bereyekî yekgirtî da be yek bigen û le ast ew pêkewtine da bin ke kêşey kurd le ser astî nêwneteweyî bexowey debînê.

Bem core, hawkarî nêwan hezekanî gewretirîn parçeyê Kurdistanî gurêkî tir be têkoşan dedat lew parçeyê, be taybetîş diway hatine dereweyê pêşeway PKK A.Öcalan, êsta nîgay hemû cihan le ser kêşey kurd û be taybetîş le ser bakurî Türkiye ye. Niwênerî geli kurd le Bakur bo be siyasî û aşî çareser kirdinî kêşey kurd le hemû katêk diyardir û bercesetir e. Ke wabû bakurî Kurdistan legel damezrandinî PNBK da, le layek berey niştîmanî le seruy welat qayimtir û pitewtir dekat û le layekî dîş, be debêt be kolekeyekî pitewî Kongreyê Neteweyî. Herweha deşê bibê be nimûneyekî baş bo ser le niwê yekgirtineweyê hêzekanî parçekanî tîrî Kurdistan le naw xoyan da takû ewanîş be yek helwêstewe rû le mirabî pirozî Yeketî Neteweyî biken.

Zarokên NÇM'ya Edeneyê ji bo cîhanê dilê xwe vekirin

“Ez ji zimanê xwe hez dikim, dibistana bi kurdî dixwazim”



kin û em wan ji welatê xwe biqewirînin.

Dibêjin bavê te ketiye zindanê ji bo çî bavê te hatiye girtin?

✎ **Bêrivan (9):** Bavê min di hepsa Adiyamanê de ye. Dema bavê min hatibû girtin ez gelekî biçûk bûm, min gelekî bêriya wî kiriye, dema ez diçim dîtina wî, şîşên hesin nahêlin ku ez herim xwe bigihînim li ba wî û leşker li wê derê gelek in, li bin kincên min, heta li hundirê sola min jî dinêrin û bi me re diqehirin.

Dema tu têyî NÇM'ê tu ditirî?

✎ **Zeyneb (11):** Ma ezê ji bo çî bitirsim, ez ji bo ku zimanê xwe, çanda xwe, dîroka xwe hîn bibim tîm vê derê, yek caran hin kes dibêjin polîs insanan diparêzin, ez ji vê yekê bawer nakim, ji ber ku em kurd in, polîs jî ji kurdan hez nakin, heger ew ji me hez nekin, emê jî ji wan hez nekin. Heger heta ez mezin bibim, em welat ava nekin, ezê wê demê bibim gerîla.

Der barê Danezana Mafên Zarokan ên Cîhanê de tu çî difikirî?

✎ **Sevcan (13):** Li gorî min fikreke pir baş e. Li vir zarok tîm çewandin. Zarok ne layiqî vê yekê ne. Pêwîst e zarok neyên çewandin û kuştin. Zarok layiqî cîhaneke bêşer, bêçek û xweş in. Wekî zarokên cîhanê pêwîst e mafên me jî û welatê me jî hebe.

Tu dixwazî mesajeke çawa bidî zarokên cîhanê?

✎ **Leyla (9):** Hema hemû zarokên cîhanê bi zimanê xwe dixwînin, bila em jî bi zimanê xwe bixwînin, televîzyonên tirkan dibêjin me Serok Apoyê kurdan girtiye û xistiye zindanê ji bo çî wê serokê me têxin zindanê. Ma me serokê wan girtiye, xistiye hebsê.

FERÎDE ASLAN-FATÎH BENDEWAR
/A.WELAT EDENE

Li NÇM'ya Edeneyê nêzî hefte zarokî perwerdehiya zimên û beşên çandê yê din dibînin. Temenê wan ji heft salî bigire, heta sêzde salan e. Me xwest em hest û ramanên wan ê zarokati hîn bibin. Zarokên NÇM'ya Edeneyê ji zarokên din re dilên xwe wiha vekirin:

Tu dixwazî tu jî wekî hemû zarokên cîhanê bi zimanê xwe perwerdeh bibî?

✎ **Halime (8 salî):** Ez dibistaneke bi kurdî dixwazim, ez a tirkî naxwazim, ez ji zimanê xwe hez dikim, ji hevalê xwe hez dikim, ez ji welatê xwe hez dikim. Ez ji mamosteyê xwe yê li mekteba tirkan hez nakim, ez ji mamosteyê xwe yê li NÇM'ê hez dikim, ji ber ku ew dersan bi kurdî didin me, ez ji qoriciyan gelekî diqehirim wan gundê me şewitand. Pîrika min got mala me neşewitînin, wan li pîrika min jî xist û tew wan mala me jî şewitînad. Ez ji polîsan jî deqehirim, Ew hatin, wan bavê min girt û bir.

Li dibistana tirkan hem zarokên tirk hem jî yê kurd hene, Ji bo çî tenê dersa tirkî didin?

✎ **Remezhan (10):** Li dibistana tirkan hem zarokên kurd hem jî zarokên tirk hene, lê zarokên wan bi tirkî dipeyivin, ême em newêrin bi kurdî dipeyivin. Dema em li dibistanê bi kurdî dipeyivin jî em bi dizî dipeyivin, ev jî bo me tiştê gelekî ne baş e.

Tu perwerdehiyeke çawa dixwazî?

✎ **Sinan (11):** Ger ji bo zarokên kurd dibistaneke bi kurdî hebûya wê baştir bibûya. Wê demê tirkan ê bi tir-

kî, kurdan jî bi kurdî bixwendanê ez dixwazim herim Kurdistanê.

Tu bi kurdî dixwî?

✎ **Rojda (10):** Erê ez û bavê xwe em bi hev re li bulmeceya Azadiya Welat dinêrin û em dinivîsînin, lê ev tenê ne bes e, divê mirov her roj bixwîne.

Hûn li dibistana tirkan çî dikin?

✎ **Kanîwar (9):** Mamosteyê me tenê dersa tirkî dide me. Her kes bi tirkî dixwîne. Rojê hevalekî me ku navê wî Remezhan bû got “bijî Serok Apo”, mamoste dema pê hesiya hat lîxist û pê re qehirî got ku “tu careke din wilo bibêjî ezê te bibim destê polîsan”, em wê çaxê gelekî tirsîyan.

Bangek te ya çawa ji zarokên cîhanê re heye?

✎ **Berfîn (10):** Ez dixwazim zarokên cîhanê destê xwe bidin destê me û em jî ji xwe re welatê xwe ava bikin. Welatê hemûyan heye, ji bo çî wê ême tune be, ji bo çî? Ma qey em jî ne insan in, bavê min diçe dixebite, dema tê mal dilê min pê dişewite.

Dema tu li kolanan zarokên ku selpakê difiroşin û bayoxê dikin dibînî, çî tê hişê te?

✎ **Yusuf (9):** Gava ez wan dibînim, kurd û tirk tîm bîra min, kurd hemû xizan in, tirk jî dewlemend in. Ji ber vê yekê zarokên kurd selpakê difiroşin û boyaxa qundireyên dewlemendan dikin, car caran ez jî diçim boyaxê dikim, ji bo mesrefa xwe ya dibistanê divê ez bixebitim.

Tu ji ku derê yî û hûn ji bo çî hatin Edeneyê?

✎ **Gulistan (8):** Ez ji gundê Mêrdîn Zonê me, em berê li wî gundî rûdiniştin lê qoriciyan gundê me şewitandin em ji mecbûrî hatin Edeneyê, dewleta tirk gelekî bêwijdan e, ez dixwazim ez vî tiştî bibêjim, gerek em gelê kurd li ber xwe bidin. Ez dixwazim vegeim gundê xwe, li gundê me kar berxik hebûn, min pir bêriya wan kiriye. Ez dixwazim gelê tirk piştgiriye bide gelê kurd, ez aştiyê dixwazim, şer naxwazim. Ez dixwazim bangekê ji bo Serok Apo bikim. Ez dixwazim Serok welatê me ji me re çêbike û kullîlk tê de şîn werin.

Tu cîhaneke çawa dixwazî?

✎ **Sevil (10):** Ez cîhaneke gelekî xweşik dixwazim, her kes wekî bîra bi hev re bijî, ez tiştên gelekî baş dixwazim lê dewlet gundê me dişewitîne. Dewlet şer dike, me dikuje. Dewlet zarokan dikuje, her tiştî dikuje. Ez mezin bibim, ez dixwazim ez jî bibim wek xaltîka xwe Leyla Kaplan (Bermal).

Tu dixwazî ji hevalên xwe yê li Kurdistanê re çî bibêjî?

✎ **Emine (10):** Ez dixwazim em jî milê xwe bidin hevalên xwe yê li Kurdistanê û bi vî awayî welatê xwe ava bikin. Ê me welatê me Kurdistan e. Yê tirkan jî tenê hinek leşkerên wan hene li welatê me. Bila ew jî ji wê derê derkevin û em vegeim welatê xwe. Leşkerên tirkan li hemberî me şer dikin, gerek em jî li hemberî wan şer bi-

Salnameya NÇM'ê ya 1999'an derket



Navenda Çanda Mezopotamyayê di encama xebateke çend mehan de salnameya rojê ya bi demjimêr bo sala 1999'an derxist. Wekî tê zanîn NÇM her sal salnameya rojê ya bi demjimêr diweşîne û digihîne ber destê gel. Di vê salnameyê de jî digel agahiyên salnameyî gelek mijarên têvel cih digirin.

Di salnameyê de bûyerên dîrokî, portreyên şehîdên Tevgera Azadiyê, helbestvan, nivîskar û siyasetmedarên navdar ên kurd û biyanî, roja jidayikbûn û mirina rewşenbîr, siyasetmedar, rêberên gelê kurd û kesên navdar ên cihanê, ferhengoka kurmancî û kirdkî, gotinên navdaran, helbestên helbestvanên kurd û yên cihanê, stran û marş, kurtedanaşîna bajarên Kurdistanê cih digirin.

Her wiha ger ku mirov bixwaze tûrikê xwe bi zargotina kurdî tijî bike, di-

kare di vî warî de jî ji salnameya navborî sûtê wergire. Bo nimûne ji zargotina kurdî navên kurdî yên zarokan, pêkenok, tiştonek, çarok, gotinên pêşyan, biwêj û hwd. cih digirin. Li aliyê din di bin sernavê "Di pêvajoya dîrokê de girtîgeh" de agahiyên li ser bûyerên ku li girtîgehên cihanê û Kurdistanê qewimîne, têne dayin.

SERWÎSA ÇANDÊ

Ji HÎK'ê Mewlûda Kurdî

Hereketa Îslamî ya Kurdistanê (HÎK) hefteya derbasbûyî de pirtûkeke nû bi navê "Mewlûda Nebî" çap kir. Mewlûda ku temamê bi zimanê kurdî hatiye nivîsandin, ji bo misilmanên kurd valahiyeke girîng tijî kir.

Mewlûd hem bi latîni, hem jî bi erebî

Mewlûd, di sed-sala 15'an ji aliye Melê Ehmedê Batê ve hatiye nivîsandin. Berhema navborî hem bi tipên latîni û hem jî, bi tipên erebî ji xwendavanan tê pêşkêşkirin.

Di ola îslamê de mewlûd cihekî girîng digire û ew li ser navê Hz. Mihemed tê xwendin. Hinek dikarin bibêjin di mewlûdê de çi heye? Mewlûd li ser jiyana û tekoşîna Hz. Muhemed radiweste û di rojên taybet û girîng de tê xwendin. Mewlûda ku ji aliye Melê Ehmedê Batê ve hatiye nivîsandin ji 19 beşan pêk tê. Ka guh bidin beşek ji vê mewlûdê;

"Cumle zerrate cîna, da ev nîda Kirne gazî pêk ve gotin: Merhaba

Merhaba ey sîrrê Furqan merhaba

Merhaba ey derdê derman merhaba

Merhaba ey canê Baqî merhaba
Merhaba uşşaqê saqî merhaba

Merhaba ey alî sultan merhaba
Merhaba ey kanî îrfan merhaba..."



Hereketa Îslamî ya Kurdistanê vê mewlûdê di vê meha remezanê de diyarî hemû misilmanên kurdî dîke.

Mele Ehmedê Batê kî ye?

Li gorî zanyarê rûs A. Jaba Mele Ehmedê Batê, li gundê Batê ku girêdayî Culemêrgê ye û di navbera salên 1417-1491 de jiyaye. Berhema herî mezin a Mele Ehmedê Batê "Zembîl-

firoş" e. Mele Ehmedê Batê di vê pirtûka xwe de Destana Zembîlfiroş wekî helbestê nivîsandiye. Piştî pirtûka "Zembîlfiroş" berhema herî girîng a Mele Ehmedê Batê "Mewlûd" e.

Destnivîsên orjînal ên "Mewlûd" a Mele Ehmedê Batê ji welatê wî dûr li bajarê Rûsyayê yê bi navê Leningradê (Petersburg) li pirtûkxaneya Saltikov-Şedrin tê hilanîn.

PERWER BENGÎ

Nûdem

OSMAN ÖZÇELİK



Nûdem navê kovareke kurdî ye. Kovara hunerî, edebî û çandî. Ez gelekî meraq dikim ku bê çend xwendevanên vî quncikî navê Kovara Nûdemê bihîstine an jî kovar bi xwe xwendine.

Selehê xwediyê dikana kitêbên kurdî "Medya" ya li Galatasaray Stenbolê li dikanê ji min re got: "Ez dixwazim kovareke demsale ya bi kurdî derxînim, min xebata fîzîbîlîteyê qedandîye." Min got: "Baş e." û min xwendina xwe ya Azadiya Welat nebîrî. Seleh got: "Xuya ye vê projeyê bala te nekişand." Min got: "Çima, te çawa fêmkir?" Seleh got: "Ev çil sal in ku ez te nas dikim, kengê qala rojnameyê an kovareke bi kurdî bibe, destê te di nava xwînê de be jî tu karê xwe berdidî. Belê vê carê qet bala te nekişand."

Bêyî ku ez serê xwe ji xwendinê rakim, min got: "Rast e." Seleh dixwest bala min bikişîne ser projeya xwe û domand: "Ma tu dizanî wê navê kovarê çi be?" Bersiva min "Ma Seleh ezê ji ku zanibim" bû. "Avzelalk" wê navê kovarê Avzelalk bûya û wê zehf bi qalîte bûya. Seleh Kovara Nûdemê hejmara 27'an a payiza 1998'an da destê min. Got: "Aha! wê Avzelalk ne kêmkî Nûdemê be." Seleh bi ser ketibû. Min xwendina rojnameyê kuta kir û xar bûm Nûdemê. Rojname her tim di çentê min de bû, lê Nûdem?

Nûdem ji adara 1992'yan û bi vir de, li Swêdê bi kedeke zehf bi qîmet ji aliye birêz Firat Cewerî ve tê weşandin. Di heft salan de 27 hejmar... Kovar demsale ye. Ango kovar her tim di dema xwe de hatiye weşandin. Navê tu weşanên din ên kurdan nayê bîra min ku di demeke wiha dirêj de ewqas bi sîstem hatibe weşandin. Ev serkeftîneke hêja ye ku divê mirov birêz F. Cewerî pîroz bike.

Ji ber ku kovar li Swêdê tê weşandin bi hêsanî nakeve destê mirov. Belê her car riyek peyda dibe û ez û Nûdem di-

gihêjin hev.

Berga hejmara 27'an ji tabloyeke wênesazekî mezin ê kurd, birêz Remzî hatiye girtin. Remzî wênesazekî kurd ê li Ewrûpayê bi nav û deng e. Di havîna 95'an de min ew li atolya wî ya li Parîsê ziyaret kiribû. Birêz Remzî kurdekî ji Kirikhaneya Antaqayê ye. Koçberê kevî polîtîk e. Paşnavê malbata wan li Tirkîyeyê Paşa ye. Remzî Paşa.

Di berga Nûdemê de keçek li qehweyekê bi tena serê xwe rûniştîye, xemgîn e. Tablo rengên pastel, bi boyaxa dohnî hatiye çêkirin. Remzî ji min re gotibû di vê dema paşîn de balê dikişîne ku jinên Ewrûpî çiqas di nava jiyaneke modern û civakî de bin jî dîsa bi tenê û xemgîn in. Di van salên dawîn de ji Kurdistanê pir koçber hatin. Koçberên kurd jî di nava jiyaneke biyanî de bi tenê û xemgîn in. Ev jin û mêrên bi tenê û xemgîn nagihêjin hev û din. Ez jî wêneyên wan çêdikim.

Bravo ji Firat Cewerî re ku tabloya Remzî ya keçek nîvtazî bi cesaret ji Nûdemê re kiriye berg. Jiyan bi hunermend û rewşenbîran bêtirs bi pêş dîkeve.

Apê Selîm û hevalê wî

Apê Selîm û hevalê wî Hemze diçin karwanîyê. Gava di ber gundekî re derbas dibin, ti dibin û dibêjin: "Em biçin ser kaniyê ji xwe re avê vexwin." Gava digihêjin ser kaniyê jinkên ku li ser kaniyê ne li wan dimihêrin. Hemze hêdika xwe ber bi Selîm ve xwar dike û dibêje:

- Selîm, qey van jinan em ecibandin û ji me hez kirin! li me mêze dikan?

Apê Selîm bersivê dide û dibêje: "De here lo kuro! Ew aniha dibêjin ev pîsê heram çî hatine ser kaniya me, kaniya me herimandine, tu çî dibêji!"

Ev cihê min e!

Jinîkek wekî her gav êvarê li otobûsê siwar dibe û ber bi paşîya otobûsê ve diçe. Li paşîya otobûsê mêze dike ku yek rûniştiye, jê re dibêje:

- Rabe! Ev der cihê min e! Ezê rûnêm.

Zilam bi awayekî şaşbûyî dibêje:

- Cihê te yê çî?
- Ez ji te re dibêjim rabe!
- De here lê! Ez ranabim!

Jinîk bi kulman dikeve ser zilâm û lê dide. "Ev cihê min e, kûçik! Ez her roj li vê otobûsê siwar dibim û her tim jî li vir rûdinêm."



Di otobûsê de bazara cih

Otobûs mişt tije bû. Ji xeynî cihê rûniştinê, cih nîn bû ku kes li ser piyan jî bisekine. Di wê rewşê de zilamek "Altılı ganyan" dilîze. Bi leqîna otobûsê re ber bi vî alî de diçe, ber bi wî alî ve tê. Mêze kir fêde nade, ji zilamê rûniştî li ber xwe pirsî û pê re ket bazara cihstandinê:

- Tu li ku derê peya dibî?
- Du rawestgeh paşê.
- Wê çaxê gava tu peya bûyî cihê xwe bide min.

Zilam şaş ma. Li ser şaşmayîna zilâm, zilamê din bi îsrar domand: "Binêr tu cihê xwe didî min ha! Temam! Binêr cihê te yê min e ha! Binêr tu cihê xwe bidî min Altılıha min lê bixwe ez ê berika te germ bikim ha!"

BERHEVKAR: C. ANDOK

Roketavêj

Di sala 1993'yan de li gundê Bêkendê yê bi ser Misircê ve di navbera hêzên dewleta tirk û gerîlayên ARGK'ê de şerekî giran derdikeve, di encama şer de gelek leşker têne kuştin. Ev rûdan dibe sedem ku hêzên dewletê li herêmê dest bi operasyonê mezin bikin. Di dema operasyonê de ji davêjin ser gelek gundan û li malan sehkirinê pêk tînin. Ji wan malan yek jî mala Xalê Reşîd e. Di mala xalê Reşîd de roketên tînin. Fermandarê leşkeran gelekî diqehire û bi ser xalê Reşîd de diçe da ku bizane ka kê ew roket danîne mala wî.

Lê Xalê Reşîd qet manewiyata xwe xera nake û dibêje:

- Bi navê Xwedê û bi Şêx Hesênê Badayê ev roket ên min in. Ez mirovekî xwedan dijmin im, min ji bo parastina canê xwe ew kirîne.

Fermandar bi qîrîn dibêje: Ê baş e! Me fêhm kir tu xwedî neyar î. Me fêhm kir di mala xwe de roketan vedîşerî. Lê ka roketavêj?

Bersiva Xalê Reşîd bi vî rengî ye: Peryên min bi tenê têrî van roketan dikir. Piştî ku peryên min çêbin, bi destûra xaliqê alemîn, emê roketavêjan jî, tanq û teyareyan jî bistînin.

BERHEVKAR: SALIHÊ KEVIRBIRÎ

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (154)

XAÇEPIRSA

Çi S	Çi E	Çi B	Çi R	Çi İ	Çi B	Çi T	Çi A	Çi N	Çi İ
S	E	B	R	İ	B	T	A	N	İ
K	R	A	F	T	A	M	A	R	
E	L	L	E	M	O	A	L	A	
E	N	A	T	N	E	D	İ	M	
A	F	A	T	T	O	E	Z	A	
T	R	G	İ	M	A				
N	İ	V	R	O					
O	N	E	V	İ	N				

Bi tirkî kor	Xwişka mezin	Mamo berepaşki	Tipa dû ryê	Agir	Emr
Metin ... wêne	Li hemberî zêde	Peyva telefonê	Emniyet	Asiman	
Cihê ku mirov tê re diçe		Qels, zeif			Bi kirdkî endam
Gihanek		Taybet			
	Serokî Şoreşa Çine Nazdarî		Tipa dû Kyê	Hevalê Zinê	
Tipek	Tipa dû qyê				
Kis, torbe	Fikir	Bi taybetî, Özellekle			
			Sembola hidrojenê	Xwarina bingeşin	
			Qeda	Bi tirkî lorin	
Teyrek		Bêhn			
Malbat		Behs Berepaşki			
				zayin (dema bori) berepaşki	
Xwedayek					
Pireka Qazi Mihemed		Eşireke kurdan			

Bersiva Xaçepirsa 152'an


Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 154'an Dîwana Feqiyê Teyran 'ey avê av' e.

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnişana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata 152'an Kasetaya Mihemed Şêxo 'Ay lê gulê' qezenç kirine ev in:

Nedim Gül/ Dilok, Remzi Kolhanlı/Riha, Bekir Turan/Semsûr, Şemsi Kaya/ Mereş, Rêzan Yıldız/ Skenderûn



PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4

Tîj akewt vewra vilêşiyena

Meseleya neteweyê kurd, ewro biya navneteweyî û kewto rojewê dinyay. Roma qandê na mesele biya navend û paytexta kurdan. Çi rê ke, serokateyê neteweyê kurd na şaristan de qandê çareserkerdina mesele biryargeha xo nawo ro û tiya ra fikir û ramani jêw bi jêw abeyenê û kewnê diplomasîyê dinyay miyan. Serokateyê neteweyê kurdan, zerya diplomasîya dinyay de ronîsto û nêveradano ke qe kesê jî xo na mesele ra bireyno.

Hetanî nika dewletanê xerîban nêwaştê nê dramî bivînê û biyarê rojev. La belê ewro, kurdan ebi serokateyê netewê xoya û ebi qiwetê şarê xoya neheqeya bandorkaran û emperyalîstan ard çiman ver. Ney ra tepya qet dewletê jî nêşeno na dram ra çimanê xo binimno. Çimke dram kewt keyê înan miyan.

Ewrûpa, Amerîka û Rûsya hîrê het ra kurdan sero newe ra politîkanên xo awa kenê. Ewrûpa wa Rûsya ya piya wazena bakurê Kurdistanî de, Amerîka wa jî wazena başûrê Kurdistanî ser ra virazo. Bakur de PKK, Başûr de PDK û YNK wayirê hêzî yê. Coka Ewrûpa û Rûsya têkiliyên xo ebi PKK ya, Amerîka wa jî wazena ebi PDK û YNK ya virazo. Amerîka, Tirkîya, Îsrail, PDK û YNK ya werteyê rojhilat de politîkayê sero amey werê û rayî day xo ver û iyê çorşmeyê a

ray de şinê. Heta niyê bakurê Kurdistanî ra jî heveyê reformîstan jî genê xo het. Ze ke yeno zanayin Otelê Hiltonî yê Enqerey de çorşmeyê nê fikirî de jêw jî kombiyayin viraziya. Niinan raya nê kombiyayinî ya wast ke kurdanê bakurê Kurdistanî jî tewrê polîkaya xo bikirê. Feqet kurdanê bakur zey verî goşê xo qe nêda nînan. Çi ke şar o nînan rind û nezdi ra silasneno ke nê çi merdim ê û wazenê ke çi bikirê.

La belê kiştî bîn ra Ewrûpa û Rûsya hewna qerarê xo yê çareserkerdina meseleya kurd zelal nêkerda. Nê dewletî béguman heme çi ra xebardar ê. la belê wayirê însiyatîfî niyê. Coka, verpersê PKK'î nêşenê bidê. Serokateyê neteweyê kurdan dest dawo zerya înan ser û zor dano ke însiyatîfî vejyên werte. Nê dewletî se bikirê jî, iyê nê rojanê verniya ma de însiyatîfan vejê werte.

Cayê çareserkerdina mesela kurd, bakurê Kurdistanî yo. Başûr tenya qandê awakerdinê bes nêkeno. Des serî ravêrd, hewna jî Başûr de çiyê awa nêbi. Winî ayseno ke oyo ebi sereyê xoya, nêbo jî. Çi ke leteyê girdê Kurdistanî bakur de mendo û Tirkîya wa politîkanê wayirê nê letey ra zaf tersena. Ewrûpa wa jî coka nêwetana finê ra PKK ya dekewo têkiliyan. La belê nêwazena dûrî de jî vindero. Coka jî goreyê vînayanê ma Dew-

letê Ewrûpa yê ewro ra tepiya têkilî virazê û raya çareserkerdin akirê.

Emser Papay, pîrozkerdina sera newî de ebi kirdasî, sersale kurdan pîroz kerd. Papay qandê weşîna kurdan wina vat: "Sersala we pîroz be." Papay ebi na meseja xoya neviya meselê kurdan de ca girot. Bêgûman nê mesajên wînanî qandê aşî û birateya şaran yenê ziwan. Xora ma jî şaran ra aşî û biratî wazenê. Serokateyê netewê kurdan jî sersereya xiristîyanan pîroz kerd. Nê mesajî hêdî hêdî kurdan û şarên xerîban anê pêhet û raya diplomasî akenê. Dîroka kurdan de têkiliyên diplomatîk hetanî nika hendayê rind vera ver nêşîbî.


Şoreşê kurdan ewro kewto rayêda derg û barî. Lozanê kurdan viraziyo. Însanetey qandê na dram newdî ra kewno îmtîhan. Hele demokrasi û aşîya Ewrûpa verpersê na mesele ra, oyo rind û weş biayso Heto bîn ra jûbiyîna kurdan jî, ewro xeylê îmtîhan dano. Eke kurdî bibên jêw û jêw fek ra fikir û ramani xo biyarê ziwan iyê na îmtîhan ra zaf rehet ravêrd. Serokateyê netewê kurdan her gi roj Roma de qandê weşîna



kurdan ya newî çend ke ma vajim zelal îradeyê jûbiyîni ano ziwan. Şar ebi gan û mejgê xoya biyo jêw û çorşmedê serokatey de vinderdo. Şest û jêw welatparêzî adir verday ganê xo. Nê welatparêzan raya îxanetey ebi weşîna xoya birnay û zey tîja jûbiyîni kurdan ver de akewtî. Na tîj şewqê xo da dinyay. Ney ra tepya dinya biwazo jî, nêwazo jî iyê qandê insaneteya zey sera vîst û jêwîni verpersê serokateyê neteweyê kurdan bidê. Nika ra rojên akewteyê aysenê. Însiyatîf kewto destanê kurdan, kurdî yê qerarê xo yê dîrokî bidê. Nê rojên dîrokî ra wa qe kes nêterso. Çi ke Tîj akewt, vewra vilêşiyena..

ZÜLKÜF KIŞANAK

TÎJ



LERZAN JANDÎL

Aşîtiye?

Dîroka şarê ma de sera 1998'ê de xêlê vurnayenê neweyî bî. Nînan ra tewr balkêşî Suriyeye ra veciyena Serokê PKK birêz A. Öcalan biye.

Sê êno zanayene, Tirkîye zor da Suriye, ke wa A. Öcalan nê welatî biterkno. Bê guman Tirkîye teyna xo ser nêşîkîna/nêşîkiyêne zorêde niyanên bidêro Suriye. La belê ebi hetkariya Amerîka û Îsrailî dewleta Tirkî waştene xo arde sare.

Îtîfaqê Tirkîye, Amerîka û Îsrailî ebi naye jî nêvindert, mudaxaleyê Rûsya jî kerd, ke wa birêz Öcalan naca jî biterkno. La belê amayena birêz Öcalanî ve

Îtalya de gelê kesan bawer kerd ke endî tesîrê nê îtîfaqî nêbeno, nê nêşîkîne zor biderê Îtalya. Na baweriye hetê re raşt a, la belê heto bîn ra tesîr ebi NATO, ebi dewletanê Ewropanyanê bînan êno kerdene. Seke ma jî televîzyon û rojnameyan ra musenîme, nê pêro piya zorêde giran nânê re Îtalya ser.

Senaryoyê ke hetanî nika hetê dewletanê Ewropa amê wiraştene, ma wendî û heşnayî. Nê çaraserkerdena problemê kurdan de na sate rolêde bingeyîni nêşîkîne/nêwazenê kay bikerê.

Hama nayê re zaferî, ameyena birêz

Öcalanî ra dima, sebateke kurdan ebi raya diplomasî bêro çareserkerdene, gelê kesan hêviye kerde, ke yan jî waşt, ke êndî dewleta Tirkî jî hêdiya hêdiya bena nerm, çareserkerdena na mesela bêlec wazena, yan jî, dewleta Ewropa seba na raye şîkîne zor bidirê Tirkîye, ke wa a jî xo hazir bikero.

Bê guman hêviyê niyanênî, waştene niyanênî zaf cayê xo de rê. Her keso ke merden, kiştên û zulim nêwazeno, ganî nê çiyani biwazo.

La belê ma dîroke ra şinasnenîme. Dewleta Tirkî demê Osmanîyan ra jî nat, qe rojê xora, ebi waştene xo, ebi kêfê xo, seba menfeetê şaran û şenikayînanê bînan, seba çareserkerdenê problemê dînan, seba avêşiyena şaran, cemaetan, teknoloji û îlmî vurayena, avêşiyayenî, reformî nêwaştê û nêkerdê.

Peymana Berlinê sera 1878 ra bicêrê hêrê-bê guman naye ra verî jî esto- hetanî wedardena madeyana qanûne ceza 141 û 142'yî, pêro ebi zorê teberî, ebi waştene dewletanê bînan amê kerdene.

Ya kew ke pîmîka nînan soyiya herd ra, qewetanê bînan birnîka nînan soyna

hard ra, rayêde nînaya bine nêmendana, nê mecbûrê vuriyayan/vurnayenan, mecburê reforman mendê.

Ewro jî na wa. Hetanî dewleta tirkî tenge de memano, bêfasala û bêteqete memano, zoro ke dayê ser ro zorê daye bi xo ra zêderî mebo, na dewlete reforman nêvirazena, gamanê newiyan nêwezana û çareserkerdena meselaya kurdan nêwazena.

Seba naye jî kilît destê kurdan de ro. Yanê kilîtê pîmîka TC ye hard ra soynayena destê kurdan de ro. Kurdan îmtîhano verên Roma de ebi birêz A. Öcalanî veciyena rind da. Îmtîhano bîn jî nê rojanê newiyan de ebi avakerdena "Platforma şariyê yê Kurdistanê Bakurî" da. Nê herdimîn gamî, seba gamanê girsêriyan hêviye danê şarê ma.

Her çiqe ke ma miyan de huna problemê estê jî, ma ganî seba nê gamanê corênan bixebitîme, problemanê wertê xo, xo miyan de hal bikerime. Na derheq de jî baro giran zê herkesî, la belê herkesî ra ver doşanê partî û organîzyonanê ma ser ro yo.

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (Îmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN

■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308

Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212)
245 16 50 - 251 79 37 - 251 90 13
FAX: 251 95 85

■ Gerinendeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMI TAN
■ Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

■ NİVİŞGEHÊN TÊKİLİYÊ
(İrtibat büroları)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83

■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmir
Tel-fax: 0 (232) 425 37 02
■ Edene
Tel: 0 (322) 351 42 78
■ München:
(Nünerê Giştî yê Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815

■ Swîsre:
İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
■ Hollanda:
S. A. Fewzi
Tel-Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsiç

Bi êgir re govend gerand

Mazlûm Doğan bi çalakiya xwe, Efsaneya Kawa bi şeweyekî hemdem xiste rojeva kurdan û di nav kurdan de wekî Kawayê Hemdem hate binavkirin. Îro jî, evînên nivcomayî yên Mem û Zînê, Xecê û Siyabend û Derweşê Evdî ji aliyê nifşên nû ve têne temamkirin.

Bêguman di nav kurdan de çirokango bûyerên destanî zor navdar in. Heta niha belkî bi dehan destan hatine nivîsîn. Lê bi qasî wan yên ku zêde nav û deng nedane hene. Lê balkêş e, dema mirov li destanên berê meyze dike, xwestekên şexsane di nav wan destanan de serdestin. Wekî mînak, di destana Mem û Zîn, Xecê û Siyabend û her wiha Derweşê Evdî de, ev yek bi awayekî berbiçav têne dîtin. Dema mirov bala xwe bide wan evînan bi taybetî negihîştine armanca xwe. Hestên neteweyî di wan destanan de xuya nabe.

Lê îro naveroka wan destanan diguhere. Mazlûm Doğan bi çalakiya xwe, Efsaneya Kawa bi şeweyekî hemdem xiste rojeva kurdan û di nav kurdan de wekî Kawayê Hemdem hate binavkirin. Îro jî, evînên nivcomayî yên Mem û Zînê, Xecê û Siyabend û Derweşê Evdî ji aliyê nifşên nû ve têne temamkirin.

Heta niha gelek welatparêzên kurd, piştî ku Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan çû Romayê agir bi bedena xwe xist û wan bi vî awayî rê li ber destanên nûjen vekirin. Di nav wan de ya herî balkêş, di dîroka kurdan de yekem car e ku mirov lê rast tê, xweşewitandi-

na dayikeke 63 salî ye. Evîna di destana Mem û Zînê de, îro di çalakiya dayika Hatice Falay de tê dîtin. Dayika Xecê ji çalakiyên xweşewitandinê yên piştî ku Öcalan diçe Romayê bandoreke mezin digire û ew jî roja 13'ê meha berfanbarê li mala xwe êgir bi bedena xwe dixê û cihê xwe yê di nav kerwana destanên nûjen de digire.

Dev ji min berdin lo!

Dayika Xecê berî ku cihê xwe yê di nav kerwana destanên nûjen de bigire, di Newroza 97'an de dixwaze xwe bavêje nav êgir û di nav agirê Newrozê de dest bi meşa xwe ya azadiyê bike. Lê wê hingê çend ciwan li ber dayika Xecê dibin asteng û nahêlin ku ew bedena xwe bi xweliya êgir re bike yek. Di wê navberê de hevalê Dayika Xecê, Apê Qehreman bi meselê dihesê û bi Dayika Xecê re diaxive. Apê Qehreman ji Dayika Xecê re dibêje: "Xecê tu çi dikî? Ma ev karê te ye?" Dayika Xecê jî lê vedigerîne: "Kuro dev ji min berdin lo! Hey emê bimirin, bila em bi

Dayika Xecê bi vê gotina

xwe dîsa li êgir veg-

eriyabû. Belkî

dixwest ku di

nav êgir de

Zerdûşt bibîne.

Dixwest ku

dîroka destanên

nûjen ên ku ji

êgir pêk tên

ragihîne

Xwedayê Êgir.

Dîsa Dayika

Êgir dixwest ku

here li kêleka

Kawayê

Hemdem, li

stêrkên ku

dişemitin

temaşê bike.

şerefa xwe û qehremaniya xwe bimirin."

Dayika Xecê hîna di sala 1997'an de riya mirina bi rûmet nîşanî qewmê kurd dida. Di Newroza 1997'an de nehiştibûn ku Dayika Xecê bikeve nav êgir û govendê bigerîne. Lê Dayika Xecê wê rojê agir xistibû dilê xwe û di dilê xwe de bi êgir govend digerand. Dixwest ku evîna Mem û Zînê, di nav agirê newrozê de bike evîna welêt.

"Ma mirov ji dijminê xwe dipirse?"

Dayika Xecê û Apê Qehreman serê sibeya Newrozê li cihê pîrozbahiyê digerin. Apê Qehreman diçe ji polîsan cihê pîrozbahiyê dipirse, lê polîs dibêjin: "Em zanin lê em nabêjin." Dayika Xecê jî ji Apê Qahreman re dibêje: "Ma mirov ji neyarê xwe dipirse? Here ji yekî din bipirse." Apê Qehreman jî dibêje: "Bila dijmin û neyarên me bibihecîn. Ma herdem emê bibihecîn?"

Dayika Xecê nedixwest ku çav li neyarên xwe bike. Apê Qehreman jî dixwest ku neyarên xwe bibihecîne. Lê Dayika Xecê di merasîma xwe de jî rastî dijmin û neyarê xwe hat. Neyarên Dayika Xecê nehiştibû ku tabûta wê bi rengên kesk, sor û zer bê pêçan. Lê dayika Xecê ew reng danîbûn ber serê xwe. Apê Qehreman belkî neyarên xwe nebihecandin, lê dilê neyarên xwe jî xweş û geş nekir.

Dayika Xecê dîsa li êgir vegeriya

Dayika Xecê ya dilciwan li ber xweşewitandina ciwanan dixwest ku serî hilde. Li fersendan digeriya. Bi dilê wê bû ku ji dêvla ciwanan ew xwe bi êgir bide nasîn. Her wiha dixwest ku sergovendiya di nav êgir de ji destê ciwanan bigire. Ji ber wê yekê jî berî ku li malê sergovenda di nav êgir de bige-



Dayika Xecê digel hevalê xwe

rîne, dibêje: "Ciwan ji me xurtir in. Ew ji me bêhtir dikarin bimeşin. Em ketine. Ew dikarin xwe di nav mejiyê dijmin de biteqînin. Lê yên wekî me, bi kêrî tiştekî nayên."

Dayika Xecê bi vê gotina xwe dîsa li êgir vegeriya. Belkî wê dixwest ku di nav êgir de Zerdûşt bibîne. Dixwest ku dîroka destanên nûjen ên ku ji êgir pêk tên ragihîne Xwedayê Êgir. Dîsa Dayika Êgir dixwest ku here li kêleka Kawayê Hemdem, li stêrkên ku dixuricin temaşê bike. Belê Dayika Xecê ji êgir hatibû û dîsa li êgir vegeriya.

Dil hebû ku neyartiya di nav xwe de bi êgir bişewitîne û bêbandor bike. Ji ber wê yekê tola xwe bi vexistina agirê bedena xwe hilîne. Ew û agir niha bi hev re, li kêleka Kawayê Hemdem û Xwedayê Êgir li stêrkên temaşê dikin.

AZAD AVAŞIN

